KU

Ville de Lausanne

Bureau lausannois pour
les immigrés (BLI)

HÛN BI XÊR HATIN




Jiyan li Lozanê
Rêbereke pratîk




3 GIRÊN
ku bajarê Lozanê li ser wan hatiye avakirin

18
TAX



5



CARAN BANGKIRINA DEMJIMÊRAN
ji aliyê nobedarê katedralê ve her şev

33 HEKTAR REZ
ên ku aîdî Bajêr in

100



ENDAMÊN
Encûmena Şarevanî

500
METRE
cudahiya bilindahiyê di navbera jor û jêra bajêr de


43 %
JI NIFÛSA LOZANÊ
ku pasaporta swîsrî tune ye

171
NETEWE




13’800
KARSAZIYÊN HERÊMÎ

1803
sala ku Lozan bû paytextê Kantona Vaudê



25’000 m²
baxçeyên sebzeyan ên bajarî û komelayetî



151’200
ŞÊNÎ
di Çileya 2026an de

34’600
XWENDEKAR
ku her sal li Lozanê perwerde dibin



300
KOMELE Û KLÛBÊN WERZÎŞÊ
li Lozanê

Naverok

Peyama pêşwazîkirinê 4

Hevkarîya hatina we 6

Pisporên we yên koçberî,
entegrasyon û têkoşîna li dijî nijadperestiyê 8

Destûrnameyên nişstecihbûnê 12

Xanî 14

Kar 20

Kursên fransî, dîplome û perwerde 25

Dibistan 27

Zarok û malbat 30

Zewac û rewşa medenî 34

Pîremêr û pîrejin 38

Seqetî 41

Sîgorte 43

Tenduristî 47

Alîkariyên civakî yên awarte 51

Veguhastin 53

Budce, bac û telekomunîkasyon 57

Jiyana civakî û aktîvîteyên demên vala 61

Jiyana hemwelatîtiyê 64

Bicihbûn li Lozanê: pêşî divê mirov çi bike?



Va ye lîsteya karên ku divê mirov gava hatina xwe ya Lozanê bike, li gorî rêza pêşîniyê rêzkirî.

- ☐ Peydakirina lojmanekê û tomarkirin li Servîsa Kontrola Şêniyan (mawe: 14 roj) (r. 17)
- ☐ Daxwazkirina destûrnameya mayînê (herî zû) (r. 12)
- ☐ Girêdana peymaneke sîgorteya nexweşiyê ya mecbûrî (mawe: 3 meh) (r. 43)
- ☐ Tomarkirina zarokên xwe li dibistanê (r. 27)
- ☐ Tomarkirin ji bo elektrîk û gazê (r. 18)
- ☐ Sîgortekirin li hember şewat û karesatên sirûştî (r. 18)
- ☐ Guhertina destûrnameya ajotinê ya biyanî û daxwazkirina plakayên qeydê yên Swîsrî ji bo tirimbêla xwe (mawe: 12 meh) (r. 54)
- ☐ Ger pêwîst be, daxwazkirina yekgirtina malbatê (mawe: ji 1 heta 5 salan li gorî rewşê) (r. 34)

Peyama pêşwazîkirinê

Hûn bi xêr hatin Lozanê

Her sal, ji ber kalîteya jiyanê ya di navbera gol, Alp û rezan de, ji ber dînamîzma zanîngehan û ekonomiya xurt, şêniyên nû li Lozanê bi cih dibin. Îro, li bajarê me zêdetirî 150'000 şênî hene, ku 43% ji wan nifûsa biyanî ne. Ev pirrengî dewlemendiyeke pir mezin e.


Lozana ku paytexta olîmpîyatê ye, werziş ji bo her kesî kiriye şêwe jiyana hêsan: di yek ji 300 klûbên li bajêr de, li qadên giştî yan di navendên nûjen yên wek Vaudoise Aréna de derfeta sporê heye. Herwiha bi festîvalên xwe, mûzeyên xwe, opera û şanoyên xwe, ew bajarekî dewlemend yê çandê ye.

Bi projeya Plaines-du-Loup, ku yek ji projeyên herî mezin ya veguhertina bajêr ya Swîsreya frensîaxêv e, bajar diguhere; xaniyên erzan, mobîlîzasyona nerm, qadên kesk û tevliheviya civakî pêşkêş dike.

Ev ew bajare, ku em ji dilûcan dixwazin bi we re bijîn li vî bajarê aso vekirî û berê wê li dahatuyê ye.

Em bixêrhatineke germ li hemû kesên li Lozanê dikin.

Grégoire Junod, Şaredarê Bajarê Lozanê



Broşûrek ji bo jiyana li Lozanê û hestkirina bi xweşiyê

Lozan yek ji bajarên herî kozmopolît ên Swîsreyê ye. Zêdetirî 170 neteweyan li vir bi hev re dijîn, hev nas dikin, guhertinan dikin û kêliyên jiyanê parve dikin. Her roj, girêdan têne hûnandin û bihêztir dibin, da ku em hev çêtir nas bikin û hevgirtina civakî bijîn. Ev pirrengî nasnameya me ye û em wê her roj bi hev re ava dikin.

Bajarê Lozanê, bi hevkarên xwe yên saziyî û komeleyî re, her roj xebatê dike da ku her yek ji me xwe li cihê jiyana xwe baş hîs bike, bêyî ferqa esl, temen an zayendê. Ji bo Şaredariyê girîng e ku her kes xwe rewa hîs bike ku li vî bajarî bijî, li vir bixebite, dema xwe ya vala li vir derbas bike, jiyana xwe li vir ava bike û bi serbilindî bibêje: «Lozan, mala min e!»

Hûn ê di vê broşûrê de gelek agahiyên pratîk bibînin ku hemû aliyên jiyana rojane digirin nav xwe: xanî, kar, dibistan, aboriya kesanî û herwiha dema vala û perwerde. Ew hem ji bo kesên nû hatine, hem jî ji bo yên ku çend meh e an demeke dirêj e li Lozanê dijîn hatiye nivîsîn.

Ev broşûr encama hevkariyeke xweş e di navbera Nivîsgeha Koçberan ya Lozanê (BLI), servîsên cuda yên rêveberiya şaredarîyê û gelek komele û saziyên giştî yên ku li herêma Lozanê kar dikin. Ez dixwazim li vir bi dilgermî spasiya wan bikim ji bo beşdariya wan.

Ez ji we re keşfeke xweş a bajarê me dixwazim!



Émilie Moeschler, Endama Şaredariyê,
Rêveberiya Werzîş û Hevgirtina Civakî

Birêvebirina hatina we

Nêzîkî 15’000 kes her sal li Lozanê bi cih dibin û nifûs ji zêdetirî 170 neteweyan pêk tê. Hûn ji ku derê bên, Bajarê Lozanê dixwaze hatina we hêsan bike. Hûn ê gelek agahiyên bikêrhatî li ser malpera Bajarê Lozanê bibînin.

www.lausanne.ch


Şeva pêşwaziyê ya Şaredariyê

Her sal, Bajarê Lozanê kesên nû hatine vedixwîne şeveke pêşwaziyê. Endamên Şaredariyê û servîsên Rêveberiyê amade ne da ku bixêrhatina we bikin û we li ser çalakiyên xwe agahdar bikin. Wergêr jî li wir in da ku bi gelek zimanan agahiyan bidin.
www.lausanne.ch/accueil

Info cité

Nivîsgeha Info cité xala agahdariyê ya sereke ya Bajarê Lozanê ye. Personelên Info cité agahiyan didin, rê nîşan didin û alîkariya gel û herwiha kesên di rê de ne dikin, çi di kar û barên îdarî de çi jî di daxwazên keşfirinê de.

Info cité
Place de la Palud 2, 1003 Lausanne
Tel. 021 315 25 55, informationaupublic@lausanne.ch
www.lausanne.ch/infocite
Duşem heta Înê 8h-17h



Nivîsgeha Koçberan ya Lozanê (Bureau lausannois pour les immigrés - BLI)


Nivîsgeha Koçberan ya Lozanê (BLI) li wir e da ku we agahdar bike û we di warên entegrasyon, koçberî û pêşîlêgirtina nijadperestiyê de rêbertiyê bike. Ew we bi gelek zimanan li gîşeya xwe ya li navenda bajêr pêşwazî dike. Servîsên wê di rûpelên jêrîn de têne pêşkêşkirin.

Bureau lausannois pour les immigrés (BLI)
Place de la Riponne 10, 1001 Lausanne
Tel. 021 315 72 45, bli@lausanne.ch, www.lausanne.ch/bli
Duşem heta Înê 8h30-12h, 13h30-16h30 (Sêşem piştî nîvro girtî ye)

Lausanne Tourisme

Lausanne Tourisme we li ser çalakî, bûyer, xwaringeh û gerên ji bo keşfirina bajêr agahdar dike. Hûn dikarin biçin gîşeya wê da ku şîret û belgeyên bikêrhatî wergirin (broşûr, plana bajêr, hwd.). Her Şemî, gereke bi rêber ji we re derfetê dide ku hûn li ser dîroka Bajarê Navîn (Cité médiévale) bêtir hîn bibin.

Lausanne Tourisme
Avenue Louis-Ruchonnet 1, 1003 Lausanne
Tel. 021 613 73 73, info@lausanne-tourisme.ch, www.lausanne-tourisme.ch
Her roj 9h-18h
(Gera Bajarê Navîn bi koda GUIDEDTOURLAUSANNE 10 fr. e.)



Pisporên we yên koçberî, entegrasyon û têkoşîna li dijî nijadperestiyê

Li Swîsreyê, qanûneke li ser biyanîyan û entegrasyonê (Loi sur les étrangers et l'intégration - LEI) heye. Li gor vê qanûnê, divê kesên koçber gava hatin bêne pêşwazîkirin û li ser cihê xwe yê nû yê jiyanê bêne agahdarkirin. Xaleke qanûnê (261bis ya Qanûna Cezayê) herwiha hin tevgerên nijadperest ceza dike. Em li vir çend rêxistinên ku bi pêkanîna van qanûnan hatine wezîfedarkirin pêşkêşî we dikin.

Nivîsgeha Koçberan ya Lozanê (Bureau lausannois pour les immigrés - BLI)

BLI nivîsgeha Bajarê Lozanê ye ku di warê entegrasyon û pêşîlêgirtina nijadperestiyê de pispor e. Ev nivîsgeh şîretan li her kesî dike, bêyî ferqa pasaport, statû an welatê wî/wê yê eslî. Ew we bi gelek zimanan agahdar dike, mînak li ser:

- pêşkêşiya kursên fransî
- lêgerîna karekî an perwerdeyekê
- naskirina dîplomeyeke ku li derveyî welêt hatiye wergirtin
- jiyana rojane li Lozanê
- rewşên nijadperestiyê
- mafên siyasî
- pêkanîna projeyeke komeleyî ya entegrasyonê
- welatîbûn (naturalîzasyon).


BLI di saetên xebata xwe de agahiyan dide. Ew herwiha servîsên cuda yên belaş pêşkêş dike. Ev servîs li jêr têne pêşkêşkirin.

Bureau lausannois pour les immigrés (BLI)
Place de la Riponne 10, 1001 Lausanne
Tel. 021 315 72 45, bli@lausanne.ch, www.lausanne.ch/bli
Duşem heta Înê 8h30-12h, 13h30-16h30 (Sêşem piştî nîvro girtî ye)

Nobedariya Jiyan, perwerde, kar (Vivre, se former, travailler)

Nobedariya Vivre, se former, travailler we bi zimanê we li ser kar, perwerde û jiyana rojane ya li Lozanê agahdar dike. Hevdîtin bi fransî, spanî, portekîzî û îngilîzî pêk tên. Ji bo zimanên din, hûn dikarin daxwaza amadebûna wergêrekê/î bikin. Ev servîs belaş û nihênî ye.

www.lausanne.ch/permanence-bli
Duşem 17h-19h, Şemî 10h-12h (bêyî randevû)



Nobedariya Info-racisme

Nobedariya Info-racisme guhdarî û agahî pêşkêşî her kesê/î dike ku li Lozanê rûbirûyî nijadperestiyê dibe. Ev servîs belaş û nihênî ye.

Tel. 021 315 20 21, inforacisme@lausanne.ch, www.lausanne.ch/info-racisme
Duşem, Çarşem û Pêncşem 14h-17h an bi randevû

Civînên Hemwelatiyan (Rendez-vous citoyens)

BLI Rendez-vous citoyens organîze dike da ku bi taybetî beşdariya siyasî û civakî ya kesên ku ji koçberiyê tên xurt bike. Ev civînên agahdariyê an keşfirina cihên sembolîk in. Mînak, serdana Parlamentoya Vaudê an hevdîtina bi kesayetiyên ku ji bo Lozanê xebatê dikin. Ev hevdîtin belaş in lê bi tomarkirinê pêwîst ne.

www.lausanne.ch/bli-rdvcitoyens

Nivîsgeha Entegrasyona Biyaniyan û Pêşîlêgirtina Nijadperestiyê ya Kantonî (Bureau cantonal pour l'intégration des étrangers et la prévention du racisme - BCI)

BCI servîsa Kantona Vaudê ye ku di warê entegrasyon û pêşîlêgirtina nijadperestiyê de pispor e. Ew nemaze van pêşkêş dike:

- Broşûreke «Hûn bi xêr hatin kantona Vaudê» ku agahiyan dide kesên nû hatine herêma Vaudê. Ev agahî li 16 zimanan hatine wergerandin. Ew li ser malpera www.vaud-bienvenue.ch berdest in.
- Şêwirmendiya belaş ji bo her kesê ku li kantona Vaudê, li derveyî Lozanê, qurbanî an şahidê kirinên nijadperest an cudakar bûye. Ew bi randevû û li ser daxwazê bi gelek zimanan pêk tên.

Bureau cantonal pour l'intégration des étrangers et la prévention du racisme (BCI)
Tel. 021 316 49 59, info.integration@vd.ch
www.vd.ch/integration

La Fraternité

La Fraternité ya CSP Vaud ji bo hemû kesên ku agahiyên girêdayî koçberiyê dixwazin li wir e. Ev komele dikare di kar û barên we yên îdarî, hiqûqî û civakî de alîkariya we bike. Mînak ji bo daxwaza destûrnameya rûniştinê an gihandina malbatê. La Fraternité herwiha 2 nobedariyan (bêyî randevû) organîze dike:

- nobedariyeke civakî: Sêşem û Pêncşem 17h-19h
- nobedariyek ji bo bêbelgeyan: Îne 9h-12h.

Centre social protestant Vaud (CSP Vaud) - La Fraternité
Place Arlaud 2, 1003 Lausanne
Tel. 021 560 60 98, frat@csp-vd.ch, www.csp.ch/fraternite

Point d'Appui


Point d'Appui cihekî pêşwaziyê ye ku ji her kesî re vekirî ye. Ew bi belaş piştgiriyê dide kesên ji koçberiyê tên:

- Ew cihekî guhdariyê ye ji bo axavtina li ser rewşa kesane (bi randevû).
- Ew agahiyan li ser jiyana li Swîsreyê pêşkêş dike û li gor pêdiviyên wan rêberiya kesan dike.
- Ew alîkariya kesan dike da ku CV û nameyên motîvasyonê yên xwe binivîsin.
- Ew atolyeyên axavtinê bi fransî pêşkêş dike.
- Ew Sêşeman ji saet 15h heta 17h komputeran di destê kesan de dihêle.
- Ew derfetê dide ku mirov navnîşaneke îdarî tomar bike da ku posteya xwe wergire.

Point d'Appui
Rue Saint-Martin 36, 1005 Lausanne
Tel. 021 331 57 20, pointdappuivd@gmail.com, www.eglisemigrationvd.com
Duşem û Pêncşem 9h30-12h, 14h-17h, Sêşem 14h-17h, Îne 9h30-12h

Komeleyên kesên koçber

Li Lozanê, gelek komele hene ku ji aliyê kesên koçber ve û ji bo wan hatine avakirin. Bi rêya van komeleyan, hûn dikarin bi kesên ji welatê we tên an bi zimanê we diaxivin re hevdîtinê bikin. Lîsteyeke van komeleyan li ser malpera Nivîsgeha Koçberan ya Lozanê (Bureau lausannois pour les immigrés - BLI) berdest e.
www.lausanne.ch/associations-migrants



Rainbow Spot

Komeleya Rainbow Spot piştgiriyê dide kesên LGBTIQ+ ên ji koçberiyê tên û li kantona Vaudê dijîn. Ew wan agahdar dike û di kar û barên wan ên îdarî, hiqûqî û civakî de bi wan re dimeşe. Mînak ji bo:

- destûrnameyên rûniştinê
- pêvajoyên penaberiyê
- gihîştina tenduristî û sîgorteya nexweşiyê
- mafên medenî û mafên malbatê
- rewşên cudakarî û şîddetê.

Hevdîtin dikarin bi gelek zimanan pêk werin. Komele herwiha çalakiyan organîze dike ku rê li ber guhertin û hevdîtinên komî vedikin.

Rainbow Spot
Tel. 076 549 80 91, info@rainbowspot.ch, www.rainbowspot.ch
Nobedariya bi telefonê: Sêşem û Pêncşem 10h-12h
Hevdîtin bi randevû: Sêşem û Pêncşem 14h-16h

Werger û wergêrî

Hin servîs an komele dikarin we bi gelek zimanan agahdar bikin an serî li wergêran bidin. Herwiha komele hene ku servîsên wergerê pêşkêş dikin, mînak:

- **Ji bo her cure randevûyan:** komeleya Appartenances servîseke wergêrên civakî pêşkêş dike da ku hevdîtinan wergerîne. Ew dikare mînak li dibistan, nexweşxane an servîsên civakî mudaxele bike. Rêveberî bi xwe têkiliyê bi komeleyê re datînin ger hûn daxwaza alîkariya wergêrekê/î bikin.
  Tel. 021 353 53 53, interpretariat@appartenances.ch, www.appartenances.ch
- **Ji bo randevûyên bijîşkî:** komeleya M.E.T.I.S xwendekarên warê tenduristiyê kom dike ku xwe wek wergêrên dilxwaz pêşkêş dikin û dikarin di randevûyên we yên bijîşkî de bi we re bên da ku wergerê bikin.
  Tel. 079 862 64 29, interprete.metis@swimsa.ch, www.metislausanne.ch/interprete
- **Ji bo randevûyên dibistanî:** gengaz e ku mirov alîkariya wergêrekê/î wergire. Hûn dikarin daxwazê rasterast ji mamosteyê/a zarokê xwe bikin.

Hûn dikarin herwiha alîkariyê ji komeleyên civakî bixwazin (binêre r. 10).

Destûrnameyên rûniştinê

Siyaseta koçberiyê ya swîsrî

Kar û barên ji bo destûrnameya rûniştinê, bi wê ve girêdayî ne ku hûn ji ku derê tên. Swîsre cudahiyê datîne navbera wan kesên ku tên:

- ji Yekîtiya Ewropî û Komeleya Ewropî ya Bazirganiya Azad (UE/AELE)
- ji Dewleteke sêyemîn (ango hemû welatên li derveyî UE/AELE).

Destûrnameyên rûniştinê

Her kesê/a biyanî ku dixwaze zêdetirî 3 mehan li Swîsreyê bi cih bibe, hewceyî destûrnameyeke rûniştinê ye. Nemaze ji bo:

- kar an xwendina li Swîsreyê
- gihîştina endameke/î malbata xwe.

Ev destûrnameyên rûniştinê hene:

- **L** ji bo destûrnameya rûniştina demkurt
- **B** ji bo destûrnameya rûniştinê
- **C** ji bo destûrnameya bicihbûnê
- **G** ji bo destûrnameya karkerên sînorî.

Hûn li ku derê dikarin daxwaza destûrnameyeke rûniştinê bikin?

- Ger hûn ji UE/AELEyê tên: gava hatina we ya Swîsreyê, biçin Servîsa Kontrola Şêniyan (service du contrôle des habitants) a şaredarîyê.
- Ger hûn ji welatekî din tên (jê re Dewleta sêyemîn tê gotin): berî çûyîna xwe, biçin balyozxane an konsolosxaneya swîsrî ya li welatê hûn lê dijîn.
- Ger hûn ji bo daxwaza penaberiyê tên Swîsreyê: gava hatina we ya Swîsreyê, divê hûn herin xwe li Navendeke Federal a Daxwazkerên Penaberiyê (Centre fédéral d'asile - CFA) tomar bikin.

Hûn ê agahiyên berfireh bi zimanê xwe li ser destûrnameyên rûniştinê di broşûra «Hûn bi xêr hatin kantona Vaudê» de û li ser malpera Kantona Vaudê bibînin.

www.vaud-bienvenue.ch

Penaberî

Kesên li Swîsreyê daxwaza penaberiyê dikin, dikarin destûrnameyeke rûniştinê wergirin. Konfederasyon vê biryarê digire. Ev destûrnameyên rûniştinê hene:

- **N** ji bo destûrnameyeke daxwazkerê/a penaberiyê
- **B** ji bo destûrnameya rûniştinê piştî wergirtina penaberiyê
- **F** ji bo qebûlkirina demkî
- **S** ji bo parastina demkî.

Li gor statûya xwe, kesên penaber xwedî maf û erkên cuda ne. Hûn ê gelek agahiyan, bi gelek zimanan, li ser malpera Konfederasyona Swîsreyê bibînin.

www.integration-info.ch/shortinfo

Baş e ku mirov zanibe

Kesên bêbelge dikarin di hin şert û mercan de rewşa xwe rêkûpêk bikin. Nobedariya bêbelgeyan a La Fraternité ya CSP Vaud we agahdar dike û şîretan li we dike. Ew komî ye lê nenas e (binêre r. 10).



Xanî

Yek ji kar û barên pêşî yên divê mirov gava hatina Lozanê bike, tomarkirin li Servîsa Kontrola Şêniyan (Service du contrôle des habitants) e. Ji bo vê, divê navnîşaneke we ya rûniştinê ya sabît hebe. Carinan dijwar e ku mirov li Lozanê xaniyekî bibîne. Ev beş, ji bo alîkariya peydakirina xanî, pêşniyaran li we dike.

Peydakirina xaniyekî

Hûn dikarin înternetê bikar bînin da ku li xaniyekî bigerin. Hûn ê îlanan li van deran bibînin:

- www.homegate.ch
- www.immoscout24.ch
- www.immostreet.ch
- www.anibis.ch
- www.flatfox.ch

Herwiha bifikirin ku hûn bi nêzîkên xwe re jî li ser biaxivin û torên civakî bikar bînin! Mînak komên Facebookê (hay ji xapandinan hebin).

Baş e ku mirov bizanibe

Li Swîsreyê, li gorî welatên din, kêmtir tê dîtin ku mirov xwedî xanî be, li şûna bi kirê rûnê.

Atolyeyên lêgerîna xaniyan Infolog

Hûn hewceyî alîkariyê ne da ku hûn xaniyekî bibînin? Sîstema Alîkariya Civakî ya Xanî ya Bajarê Lozanê (Dispositif d'aide sociale au logement - DASL) dikare pêşniyaran li we bike û bi we re bimeşe. Servîsa wê Infolog civînên agahdariyê (Sêşem 13h30-14h30) û atolyeyên lêgerîna xaniyan (Sêşem 14h30-15h30) pêşkêş dike. Infolog belaş e û bêyî tomarkirinê ye.

Dispositif d'aide sociale au logement
Rue de l'Ale 31 (qata 1ê), 1001 Lausanne
Tel. 021 315 76 27, dasl@lausanne.ch,
www.lausanne.ch/aide-logement

Fîrmayên emlakan (Service des gérances)

Servîsa emlakan ya Bajarê Lozanê berpirsiyarê gelek xanî, cihên bazirganî û tiştên din ên bi kirê ye. Hûn ê pêşkêşiyên wan û kar û barên kirêkirinê li ser www.lausanne.ch/immobilier bibînin.

Service des gérances
Place Chauderon 9, 1001 Lausanne
Tel. 021 315 49 49, gerances@lausanne.ch, www.lausanne.ch/service-ger
Duşem heta Înê 8h-11h30, 13h-16h30 (Pêncşem berî nîvro girtî ye)

Xanî ji bo xwendekaran

Xaniyên li Lozanê biha ne û carinan dijwar e ku xwendekar wan bibînin. Çareseriyeke berbelav hevrûniştin (colocation) e. Gelek îlan li ser tevnên civakî têne weşandin, mînak komên Facebookê (hay ji xapandinan hebin). Herwiha xaniyên ji bo xwendekaran veqetandî hene. Hûn ê lîsteya wan li ser malpera Bajarê Lozanê www.lausanne.ch/logements-etudiants an li ser malperên dibistanên bilind bibînin.

Xanî ji bo pîran

Hin xanî li gor pêdiviyên kesên bi temen hatine adaptekirin. Ev xanî derfetê didin ku mirov demeke dirêjtir serbixwe bimîne.

- Xaniyên pîran (logements seniors - LS) apartman in ku ji bo kesên bi tevgera sînordar gihîştî ne.
- Xaniyên adaptekirî yên bi hevrêtiyê (logements adaptés avec accompagnement - LADA) herwiha xizmetên bijîşkî-civakî pêşkêş dikin (lênêrîn, xwarin, veguhastin, çalakî).

Hûn ê gelek agahiyan li ser van xaniyan li ser rûpela înternetê ya kantona Vaudê www.vd.ch/lada bibînin. Ev malper herwiha derfetê dide we ku hûn li gorî pîvanên xwe li xaniyekî adaptekirî li kantonê bigerin.

Hûn ê herwiha lîsteyeke hevkarên Bajêr ên ku xaniyên kalemêran û xaniyên adaptekirî li Lozanê pêşkêş dikin li ser www.lausanne.ch/logements-seniors bibînin.



Amadekirina dosyeyeke kirêkirinê

Ger xaniyek bala we bikişîne, hûn dikarin dosyeyekê bidin emlak an xwedîyan. Di vê dosyeyê de, hûn bi giştî kopiyên van belgeyan datînin:

- nasname (û destûrnameya rûniştinê)
- fşên meaşê 3 mehên dawî
- sîgorteyên berpirsiyariya medenî (assurance responsabilité civile - RC) û malê (assurance ménage) (binêre r. 46)
- dokumenta Nivîsgeha Îcrayê (Office des poursuites).

Ger hûn xaniyî bistînin, hûn peymaneke kirêkirinê (bail à loyer) îmze dikin û berî ku hûn lê bi cih bibin garantiyeke kirêyê didin.

Bala xwe bidinê!

Li Swîsreyê, hûn kirêya xaniyê xwe her meh didin. Ev heq herwiha mesrefan jî digire nav xwe (av, germkirin, berpirsiyariya avahiyê, hwd.) lê elektrîkê na (binêre r. 18).

Garantiya kirêyê

Garantiya kirêyê pir caran bi qasî kirêya 3 mehan e. Ev pere li ser hesabekî li bankekê tê danîn. Gava hûn diçin û her tişt li xanî rêkûpêk be, hûn pereyî vedigirin.

Baş e ku mirov bizanibe

Pereyê we têrê nake? Ji şirketeke garantiyê bixwazin ku ji we re deyn bike! Bala xwe bidinê: hûn ê li ser vî deynî fayîzê bidin.

Komeleya Parastina Kirêdaran (Association de défense des locataires - ASLOCA)

ASLOCA komeleyek e ku di mafê kirêdaran de pispor e. Ew wan li ser mafên wan agahdar dike û ger ew neyên pêkanîn wan diparêze. Ew herwiha bi nobedarî û hevdîtinên takekesî alîkariya kirêdaran dike ku ji bo pirsgirêkên xwe çareseriyekê bibînin. Ji bo ku mirov ji van servîsan sûd wergire, divê ew endam be. Hûn dikarin li ser vaud.asloca.ch tomar bibin.

Association de défense des locataires (ASLOCA)
Rue J-J Cart 8, 1006 Lausanne
Tel. 021 617 16 17, vaud.asloca.ch
Duşem heta Pêncşem 9h-12h, 13h30-16h30 û Îne 9h-13h30

Tomarkirin li Servîsa Kontrola Şêniyan (Service du contrôle des habitants)

Piştî dîroka hatina xwe ya Lozanê, divê hûn di nav 14 rojan de, li Servîsa Kontrola Şêniyan tomar bibin. Pêvajo bi wê ve girêdayî ye ku hûn ji ku derê tên.

Hûn ji derveyî welêt an ji kantoneke din tên

Divê hûn bi xwe li gîşeyê amade bibin. Berî ku hûn bên, li ser înternetê randevûyekê bigirin: www.lausanne.ch/guichets-ch.

Belgeyên ku divê hûn bi randevûya xwe re bînin:

- nasnameya we ya orîjînal (pasaport an qerta nasnameyê)
- peymana we ya kirêkirinê (bail)
- belgeyên ku sedema mayîna we rave dikin, mînak:
  - peymaneke kar
  - belgeyeke tomarkirinê li dibistanekê an zanîngehekê
  - belgeyên têkildarî gihandina malbatê.

Hûn ji şaredariyeke din a kantona Vaudê tên an navnîşana xwe li Lozanê diguherînin

Hûn dikarin vî karî li ser înternetê bikin, bêyî ku hûn ji cih tevbigerin. 3 îmkan hene:

1. eDéménagement

Ger şaredariya we ya berê servîsa eDéménagement bikar bîne, hûn dikarin çûyîna xwe ji şaredariya xwe ya berê û hatina xwe ya Lozanê bi rêya eDéménagement daxuyînin. Hûn ê hûrgiliyan li vir di bin beşa «Prestations» de bibînin: www.lausanne.ch/service-ch.

Belgeyên ku divê bêne şandin:

- kopiyeke nasnameya we
- peymana we ya kirêkirinê (bail).

2. Forma têkiliyê ya li ser înternetê

Ger hûn nikaribin eDéménagementê bikar bînin, hûn dikarin vî karî bi rêya forma li ser înternetê bikin: www.lausanne.ch/contact-ch.

Belgeyên ku divê bêne şandin:

- kopiyeke nasnameya we
- peymana we ya kirêkirinê (bail)
- forma «Hatin/guhertina navnîşanê» («Arrivée/changement d'adresse»).

3. Posteya kaxizî
Hûn dikarin herwiha daxuyaniya hatina xwe bi posteyê ji Servîsa Kontrola Şêniyan re bişînin.

Belgeyên ku divê bêne şandin:
- kopiyeke nasnameya we
- peymana we ya kirêkirinê (bail)
- forma «Hatin/guhertina navnîşanê» (« Arrivée/changement d'adresse »).

Bala xwe bidinê
Xizmetên Servîsa Kontrola Şêniyan bi heq in. Dayîn di dema daxwazê de pêk tê:
- li ser înternetê, ji bo kar û barên ji dûr ve (bi rêya QR-koda an lînka înternetê)
- li gîşeyê, ji bo xizmetên bi hazirî (dayîn bi pere, bi qertê an bi rêya Twintê).

Service du contrôle des habitants
Rue du Port-Franc 18, 1001 Lausanne
Tel. 021 315 31 33, www.lausanne.ch/service-ch
Duşem heta Îne 8h-11h30, 13h-16h30 (Pêncşem berî nîvro girtî ye)

Tomarkirin ji bo elektrîk û gazê


Servîsên Pîşesazî yên Lozanê (Services industriels de Lausanne - SiL) bi elektrîk û gaza li Lozanê re mijûl dibin. Piştî tomarkirina we ya li Servîsa Kontrola Şêniyan (Service du contrôle des habitants), divê hûn xwe li SiLê jî tomar bikin (tenê ger xanî an peymana kirêkirinê bi navê we be). Hûn dikarin vî karî bi rêya înternetê, telefonê an li gîşeyê bikin.

Services industriels de Lausanne (SiL) - Espaces clients
Place Chauderon 23, 1003 Lausanne. Duşem heta Îne 8h-12h, 13h-17h
Place de l'Europe 2, 1003 Lausanne. Duşem heta Îne 9h-13h, 14h-18h
û Şemî 9h-13h
Tel. 021 315 88 88, www.lausanne.ch/silcontact

Sîgortekirin li hember şewat û karesatên sirûştî (ECA)

Li kantona Vaudê, sîgorteya şewat û karesatên sirûştî ji bo xaniyê we û mal û milkên we yên bar mecbûrî ye. Divê hûn ji bo vê sîgorteyê li ba Saziya Sîgorteyê ya li dijî Şewat û Karesatên Sirûştî ya kantona Vaudê (Établissement d'assurance contre l'incendie et les éléments naturels du canton de Vaud - ECA) peymanekê çêbikin. Hûn dikarin vê bi rêya înternetê an li gîşeyê bikin.

ECA - Agence de Lausanne
Avenue du Grey 111, 1001 Lausanne
Tel. 0800 721 721, www.eca-vaud.ch
Duşem heta Pêncşem 7h30-17h, Îne 7h30-16h30



Veqetandina çopê

Cureyên cuda yên çopê û cihên cuda yên veqetandinê hene.

Çopên vezîvirandinê (recyclable):

- Divê kaxiz, cam û bermayiyên organîk di konteynerên cuda yên avahiya we de bêne avêtin.
- Divê alumînyûm, tenekeya spî û rûn di écopointên taxa we de bêne avêtin.
- PET û amûrên elektronîk dikarin belaş vegerin dikanê.
- Hemû çopên vezîvirandinê yên din dikarin bêne birin cihên çopê yên sabît an gerok. Cih û rojên berhevkirinê li ser www.lausanne.ch/ramassage in.

Çopên nevezîvirandinê:

- Çopên malê - ango çopên heta 60 cm ku nikarin bêne vezîvirandin - divê di tûrikên çopê yên fermî yên kesk û spî de û paşê di konteynerên avahiya we de bêne avêtin. Hûn dikarin van tûrikan bi mezinahiyên cuda li qesayên supermarketan bikirin.

Çopên qeblok (zêdetirî 60 cm):

- Divê çopên qeblok bêne birin cihên çopê yên sabît an gerok.

Baş e ku mirov bizanibe

Hûn ê çawa çopa xwe baş veqetînin? Pirtûkokek veqetandina çopê ya Lozanê bi gelek zimanan rave dike: www.lausanne.ch/trier.

Hevdîtina bi cîranên xwe re

Her sal, Îna dawî ya meha Gulanê, Cejna Cîranan (Fête des Voisines et Voisins) pêk tê. Ev bûyer derfetê dide we ku hûn cîranên xwe çêtir nas bikin. Ji bo organîzekirina vê cejnê, hûn dikarin şîretan ji Servîsa Mîmarî û Xaniyan a Bajarê Lozanê bixwazin (Service d'architecture et du logement de la Ville de Lausanne).

Service d'architecture et du logement
Place Chauderon 9, 1001 Lausanne
Tel. 021 315 74 13, lafetedesvoisins@lausanne.ch, www.lausanne.ch/lafetedesvoisins

Kar

Lêgerîna kar

Li Swîsreyê, ji bo lêgerîna karekî, hûn dikarin mînak:

- Bersivê bidin pêşkêşiyên kar ên li ser înternetê (mînak li www.jobup.ch).
- Xwe li ajanseke cihkirinê tomar bikin.
- Serlêdaneke spontan ji pargîdaniyên ku bala we dikişînin re bişînin.
- Bi derdora xwe re an li ser tevnên civakî li ser biaxivin.

Nobedariya Jiyan, perwerde, kar (Vivre se former travailler)

Nobedariya BLlyê ya Vivre, se former, travailler we bi zimanê we li ser kar û barên ku divê ji bo lêgerîna karekî bêne kirin agahdar dike û şîretan li we dike (binêre r. 8).

Rênîşandana pîşeyî

Navenda Rênîşandana Dibistanî û Pîşeyî (Centre d'orientation scolaire et professionnelle) mezinan, ciwanan û xwendekarên di dibistanê de li ser hilbijartinên pîşeyî agahdar dike û şîretan li wan dike. Hûn dikarin bê pere ji bo hevdîtineke takekesî randevûyekê bigirin.


Hûn dikarin herwiha, bêyî randevû, agahiyan ji Navenda Agahdariyê ya li ser Xwendin û Pîşeyan (Centre d'information sur les études et les professions - CIEP) bixwazin, ku her piştî nîvro vekirî ye.

Centre d'orientation scolaire et professionnelle de la région Centre
Rue de la Borde 3d, 1014 Lausanne
Tel. 021 316 11 20, info.osp@vd.ch, www.vd.ch/orientation

Association des demandeurs d'Emploi (AdE)

AdE hevrêtiyekê pêşkêş dike da ku di lêgerîna kar de alîkariya we bike. Mînak ji bo nivîsandina CVyekê, nameyeke motîvasyonê an serlêdana bi rêya înternetê. Komputerên bi gihîştina Înternetê jî tênе pêşkêşkirin. Beşdariyek tê xwestin: 8 fr. ji bo saetekê an 35 fr. ji bo salekê.

Association des demandeurs d'Emploi (AdE)
Rue du Maupas 81, 1004 Lausanne
Tel. 021 646 46 82, ade@ade-emploi.ch, www.ade-emploi.ch
Sêşem û Çarşem 8h30-11h30, Pêncşem 8h30-11h30, 13h30-16h30



Bourse À Travail

La Bourse À Travail ji bo kesên koçber koçîngên (coaching) lêgerîna kar organîze dike û perwerdeyan di warên cuda de pêşkêş dike (pêjgeh, firotin, karê malê, paqijkirin û paqijî). Servîs bi heq e, lê li gorî îmkanên kesê/î tê adaptekirin.

Bourse À Travail
Avenue du Léman 26, 1005 Lausanne
Tel. 021 323 77 15, bourse.travail@gmail.com, www.la-bourse-a-travail.ch
Duşem heta Pêncşem 9h30-12h

Association découvrir Vaud

Komeleya découvrir pêşniyaran û hevrêtiyê pêşkêş dike ji bo kesên koçber ên xwedî pispor ku li kar digerin. Ew servîsên cuda pêşkêş dike, nemaze:

- alîkarî ji bo naskirina dîplomeyan
- rênîşandana pîşeyî
- alîkarî ji bo amadekirina dosyeyeke serlêdanê
- amadekirin ji bo hevdîtina kar
- koçîng ji bo diyarkirina projeyeke pîşeyî
- mentorî.

Association découvrir Vaud
Rue du Petit-Chêne 38, 1003 Lausanne
Tel. 079 566 75 40, info-vd-ne@associationdecouvrir.ch, www.associationdecouvrir.ch
Duşem û Sêşem 8h30-12h30 (bi randevû),
Pêncşem û Înê 9h-12h, 13h30-16h (bêyî randevû)

Baş e ku mirov bizanibe

Hûn dikarin komputerên bi gihîştina înternetê di pirtûkxaneyên Bajarê Lausanne de bi serbestî bikar bînin. Çaperok jî tênê pêşkêşkirin, lê çapkirin bi heq e.
bavl.lausanne.ch



Dosyeya serlêdanê

Ji bo bersivdana pêşkêşiyeke kar, hûn bi giştî dosyeyeke serlêdanê dişînin. Di vê dosyeyê de, kopiyên van belgeyan hene:

- nameya motîvasyonê
- curriculum vitae (CV)
- belgeyên kar
- belgeyên perwerdeyê
- nameyên pêşniyarê ger yên we hebin.

Piştrast bin ku ev belge rojane ne, baş hatine pêşkêşkirin û li fransî hatine wergerandin.

Alîkarî ji bo nivîsandina dosyeya we ya serlêdanê

Li Lozanê, hin kes dikarin alîkariya we bikin ku hûn CVya xwe çêbikin û nameyên xwe yên motîvasyonê binivîsin. Mînak:

- l'Association découvrir Vaud : www.associationdecouvrir.ch (binêre r. 21)
- l'Association des demandeurs d'Emploi (AdE) : www.ade-emploi.ch (binêre r. 20)
- Navenda Agahdariyê ya li ser Xwendin û Pîşeyan (Centre d'information sur les études et les professions - CIEP): www.vd.ch/ciep (binêre r. 20)
- la Maison de la Femme : www.maisondelafemme.ch
- Point d'Appui : www.eglisemigrationvd.com (binêre r. 10)
- Les Scribes : www.lesscribes.ch.

Peymana kar

Li Swîsreyê, peymaneke kar diyarkirî (bi demê ve sînordar) an nediyarkirî (bêsînor di demê de) ye. Ew dikare ji bo çalakiyeke bi demjimêra tam an demê beşî be. Ew ji gava ku hûn û kesê/a ku we dixebitîne li ser mercên kar li hev bikin derbasdar e. Loma peymaneke devkî derbasdar e, lê tê pêşniyarkirin ku ew bi nivîskî bê çêkirin û bê îmzekirin.

Pirsên we li ser peymana we, mercên we yên kar (meaş, sîgorteyên civakî, hwd.) an mercên kar ên di pargîdaniyê de (dema qanûnî ya kar û bêhnvedanê, parastina tenduristiyê, hwd.) hene? Teftêşkariya Kar ya Lozanê (Inspection du travail Lausanne) dikare agahiyan bide we. Hûn dikarin herwiha serî li sendîkayekê bidin (binêre r. 23).

Inspection du travail Lausanne
Place de la Riponne 10, 1001 Lausanne
Tel. 021 315 76 80, www.lausanne.ch/itl
Tel. 021 315 76 80, www.lausanne.ch/itl
Duşem heta Înê 8h-11h30, 13h-17h (Çarşem berî nîvro girtî ye)

Meaş

Meaş ew pere ye ku kardêrê/a we her meh di berdêla kara we de dide we. Bi giştî, hûn dikarin di hevdîtina kar de li ser meaşê xwe bazarê bikin. Ji bo ku hûn bizanin çi meaşî dikarin bixwazin (li gorî pîşeya we û salên ezmûna we), serî li vê malperê bidin: www.salarium.bfs.admin.ch.

Li ser fîşa meaşê xwe, hûn ê kêmkirinên cuda bibînin. Ev beşdariyên sîgorteyên civakî ne (mînak ji bo teqawidiyê, di rewşa windakirina kar an qezayê de). Hûn ê agahiyên bêtir di rûpelên 43-45 de bibînin.

Baş e ku mirov bizanibe

Kesên ku li Swîsreyê dijîn divê bac bidin. Ev bac li gorî meaşê we, sermayeya we û rewşa we ya malbatî têne hesibandin (binêre r. 57).

Sendîka

Li Swîsreyê, peymanên kolektîf ên kar (conventions collectives de travail - CCT) hene. Ew mercên kar ên baş û meaşekî guncav garantî dikin. Ev peyman di navbera sendîkayan (komeleyên ku nûnertiya karker û karkeran dikin) û kardêran de têne girêdan.

Li ser pirsên girêdayî kar, sendîka we agahdar dikin. Ger hûn endamê sendîkayekê bin, hûn dikarin ji hin servîsan jî sûd wergirin. Mînak, parastineke hiqûqî an alîkariyeke aborî ji bo şopandina perwerdeyekê. Li gorî sektora kar gelek sendîka hene. Hûn ê lîsteyeke sendîkayan li ser rûpela Yekîtiya Sendîkayî ya Vaudê (Union Syndicale Vaudoise) bibînin: usv-vaud.ch.

Baş e ku mirov bizanibe

Ger hûn ji bo kesekî an malbateke taybet bixebitin (paqijkirin, lênêrîna zarokan, baxçevanî, hwd.), hûn dikarin beşdarî bernameya « Chèques-emploi » ya EPERê bibin. Ev parastineke civakî dide we. Mînak, sîgorteyek di rewşa qezayê de.
www.cheques-emploi.ch

Bêkarî

Her kesê/a ku li kar digere, karê xwe ji dest dide yan ji kar derdikeve dikare xwe li Nivîsgeha Herêmî ya Cihkirinê (Office regional de placement - ORP) tomar bike. Şêwirmendên ORPê alîkariya we dikin ku hûn herî zû karekî (ji nû ve) bibînin. Ji bo kesên nû hatine ku xwedî destûrnameya rûniştinê ne, ORP hevrêtiyekê di lêgerîna kar de pêşkêş dike. Ji bo sûdwergirtinê, divê mirov xwe li gîşeya wan tomar bike.

Ji bo wergirtina alîkariyeke aborî ya bêkariyê (tazmînata bêkariyê), divê mirov bi fermî bijî û di nav 24 mehên dawî de herî kêm 12 mehan li Swîsreyê xebitîbe. Destûrnameyeke rûniştinê jî mecbûrî ye.

Office régional de placement (ORP)
Place Chauderon 9 (qata 3ê), 1001 Lausanne
Tel. 021 315 78 99, orp@lausanne.ch, www.lausanne.ch/orp
Duşem heta Înê 8h-11h45, 13h30-17h

Amadekariyên teqawitbûnê

Li Swîsreyê, temenê referansê ji bo teqawidiyê 65 sal e (64 sal ji bo jinên berî 1964an ji dayik bûne). Piştî teqawidiyê, mirov êdî meaş nastîne lê maaşeke teqawidiyê (rente) distîne. Heqê ku hûn di teqawidiyê de distînin bi hejmara salên beşdariyê li Swîsreyê, bi qezenca we ya di dema kariyera we de û bi rewşa we ya malbatî ve girêdayî ye.

Di teqawidiyê de, qezenc pir caran ji berê kêmtir in. Divê mirov zû li ser bifikire. Hûn ê agahiyan bi gelek zimanan di rêbera «Préparer sa retraite sereinement» «Amadekariya teqawidiya xwe bi aramî» de bibînin. Civîneke agahdariyê ya salane ji bo Lozaniyan tê organîzekirin. Atolyeyên agahdariyê yên li gorî welatan peymanên di navbera Swîsre û welatên din de ji we re rave dikin.
www.lausanne.ch/preparation-retraite

Ajansa Sîgorteyên Civakî (Agence d'assurances sociales) herwiha we bêpere li ser teqawidiya we agahdar dike. Mînak, hûn dikarin daxwaza pêşbîniyeke stûna xwe ya yekem (premier pilier - AVS) bikin an mafê xwe yê xizmetên temamker binirxînin.

Agence d'assurances sociales
Place Chauderon 7, 1001 Lausanne
Tel. 021 315 71 00, www.lausanne.ch/aides-assurances-sociales
Duşem heta Înê 8h30-11h45, 13h-16h30 (Pêncşem berî nîvro girtî ye)

Kursên fransî, dîplome û perwerde

Kursên fransî ji bo mezinan

Axavtin û nivîsandina fransî pir girîng e ji bo dîtina karekî û ji bo entegrasyona civakî li Swîsreya fransîaxêv. Hûn dixwazin fransî hîn bibin? Gelek kurs ji bo mezinan hene, belaş an bi heq. Hûn ê lîsteya van kursan di broşûra «Apprendre à Lausanne» «Fêrbûn li Lozanê» ya Nivîsgeha Koçberan ya Lozanê (Bureau lausannois pour les immigrés - BLI) de bibînin. Ev agahî bi gelek zimanan li ser www.lausanne.ch/apal berdest in.

Di havînê de, bi dirêjahiya 5 hefteyan, BLI kursên fransî yên belaş û bêyî tomarkirinê, di asta destpêkê de pêşkêş dike. Ew li kêleka golê, li Vidy Plage, ji Duşemê heta Înê, ji saet 18h heta 19h30 pêk tên. Ev derfetek e ku mirov di hewayeke rehet de fransî hîn bibe. Pêşwaziyek ji bo zarokên ji 2 salî ve tê pêşkêşkirin da ku dêûbav bikaribin beşdarî kursan bibin.
www.lausanne.ch/vidy-plage

Baş e ku mirov bizanibe

Bajarê Lausanne perwerdeyên bingehîn ji bo mezinan pêşkêş dike. Mînak kursên fransî, xwendinê, nivîsandinê, komputerê an hejmartinê. Kurs belaş in, ji bilî tomarkirinê (di navbera 10 fr. û 40 fr. de).
www.lausanne.ch/cifea

Ev perwerde, û yên din jî, di broşûra «Apprendre à Lausanne» («Fêrbûn li Lozanê») de têne pêşkêşkirin.
www.lausanne.ch/apal

Naskirina dîplomeyên biyanî

Dîplomeyeke we ya biyanî heye û hûn dixwazin ku ew li Swîsreyê bê naskirin? Têkiliyê bi Sekreteriya Perwerdehî, Lêkolîn û Nûjeniyê ya Dewletê (Secrétariat d'État à la formation, à la recherche et à l'innovation - SEFRI) re deynin. Ew we agahdar dike ka dîplomeya we li Swîsreyê hevwateyekê heye an divê hûn perwerdeyên temamker bişopînin. Bala xwe bidinê: ev kar bi heq e û dikare çend mehan bidome.

www.sbfi.admin.ch

Komeleya découvrir servîsa Redes pêşkêş dike. Ev servîs alîkariya kesên koçber dike ku dîplomeyên xwe bidin naskirin. Nobedariyeke agahdariyê ya li ser înternetê jî bi gelek zimanan berdest e (binêre r. 21).

Sertîfkasyona pîşeyî ji bo mezinan

Hûn çend sal e pîşeyekê dikin, lê dîplomeya we tune ye? Hûn dikarin îmtîhanên dawiya şagirtiyê bidin û dîplomeyeke pîşeyî (CFC an AFP) wergirin. Ji bo amadekirina xwe, hûn dikarin kursan li dibistaneke pîşeyî bişopînin (nêzîkî 2 rojan di hefteyê de) an kursên amadekirinê yên ji bo mezinan (êvaran an Şemiyan) an bi xwe bi serê xwe bixwînin.


Hûn ê hemû agahiyan li ser portala Sertîfkasyona Pîşeyî ya ji bo Mezinan (Certification professionnelle pour adultes - CPA) bibînin.

www.vd.ch/certification-adulte

Bûrs û alîkariyên perwerdeyê

Di hin şert û mercan de, Nivîsgeha Bûrsên Xwendinê û Şagirtiyê ya Kantonî (Office cantonal des bourses d'études et d'apprentissage - OCBE), Weqfa Alîkariya Kar ya Lozanê (Fondation lausannoise d'aide pour le travail - F.L.A.T) an komeleya Envol dikarin alîkariya we bikin ku hûn heqê perwerdeyekê an mesrefên pîşeyî bidin. Serî li malperên wan bidin da ku hûn agahiyên bêtir bistînin.

www.vd.ch/ocbe
www.lausanne.ch/flat
www.association-envol.info



Dibistan



Sîstema dibistanî ya Vaudê

Li kantona Vaudê, dibistana mecbûrî 11 salan didome. Zarok di temenê 4 saliyê de dest bi dibistanê dikin û li dora 15 saliyê wê diqedînin.

Hûn ê li ser malpera Rêvebiriya Giştî ya Perwerdeya Mecbûrî û Pedagojiya Taybet a Kantona Vaudê (Direction générale de l'enseignement obligatoire et de la pédagogie spécialisée du Canton de Vaud - DGEO) ravekirinên li ser sîstema dibistanî ya Vaudê, bi 10 zimanan bibînin. Hûn ê li wir herwiha şemayên ku sîstema dibistanî ya Vaudê bi ya zêdetirî 30 welatan re berawird dikin bibînin.

www.vd.ch/scolarite

Baş e ku mirov bizanibe

Li kantona Vaudê, xwendekarên bêbelge mafê wan heye ku biçin dibistana mecbûrî û ya piştî-mecbûrî û herwiha piraniya dibistanên pîşeyî.

Dibistana giştî an dibistana taybet?

Li kantona Vaudê, 9 ji 10 zarokan li dibistana giştî ne. Ew li wir perwerdeyeke belaş û bi kalîteya bilind distînin. Dîsa jî hûn dixwazin zarokê xwe li dibistaneke taybet tomar bikin? Serî li agahî û lîsteya têkiliyên bikêrhatî li ser www.avdep.ch bidin.

Tomarkirina zarokan li dibistanê

Tomarkirina zarokên we li dibistanê yek ji wan karan e ku divê hûn gava hatina xwe bikin. Ji bo vê, biçin gîşeya Servîsa Dibistan û Paradibistanî (Service des écoles et du parascolaire - SEP). Ev servîs hemû daxwazan navendî dike û paşê zarokan li saziyên dibistanî yên Lozanê belav dike. Dibistana herî nêzîkî cihê rûniştinê tê tercîhkirin. SEP herwiha bi tomarkirina zarokan li pêşwaziya paradibistanî re jî mijûl dibe, ango berî û piştî dibistanê (binêre r. 31-32).

Hûn ê bi mamosteyên zarokên xwe re hevdîtinan bikin. Hûn dikarin daxwaza amadebûna wergêrekê/î bikin da ku van hevdîtinan wergerîne.

Service des écoles et du parascolaire (SEP)
Place Chauderon 9 (qata 5ê), 1001 Lausanne
Tel. 021 315 64 11, scolarite@lausanne.ch, www.lausanne.ch/sep
Duşem heta Înê 8h-11h30, 13h-16h30

Baş e ku mirov bizanibe

Pédibus sîstemeke hevrêtiya zarokan e bi peyatî ber bi dibistanê ve, di bin çavdêriya mezinekê/î de. Ew ji aliyê dêûbavan ve tê organîzekirin. Li Lausanne gelek rê (« lignes ») hene. Mirov dikare rêyên nû jî ava bike.
www.lausanne.ch/pedibus

Xwendekarên ne fransîaxêv ên ji 4 heta 15 salî

Servîsa Dibistan û Paradibistanî (Service des écoles et du parascolaire - SEP) bi hemû tomarkirinên dibistanê re mijûl dibe (binêre r. 27). SEP zarokan li gorî temenê wan û asta wan a fransî li polan belav dike.

- Zarokên ji 4 heta 8 salî yên ku bi fransî naaxivin diçin dibistana seretayî ya taxa xwe. Zarok di polê asayî de bi kursên fransî yên bihêz tê entegrekirin.
- Zarokên ji 8 heta 15 salî yên ku bi fransî naaxivin ber bi Navenda Çavkaniyan a ji bo Xwendekarên Alofon (Centre de ressources pour élèves allophones - CREAL) ve têne rêberkirin. Zarok di polekê de ji bo zarokên ne fransîaxêv (pola pêşwaziyê) an di polê asayî de bi kursên fransî yên bihêz tê entegrekirin. Gava asta wî/wê ya fransî têrê bike, zarok bi tevahî di polekê asayî de tê xwendin.

Hemû malbatên alofon ji hevdîtineke pêşwaziyê li CREALê sûd werdigirin. Hûn dikarin ger pêwîst be daxwaza alîkariya wergêrekê/î bikin.

Centre de ressources pour élèves allophones (CREAL)
Avenue d'Echallens 1, 1004 Lausanne
Tel. 021 315 64 86, CREALInfo@lausanne.ch, www.lausanne.ch/creal
Duşem, Çarşem û Pêncşem 8h30-12h, Sêşem 13h-17h

Xwendekarên ne fransîaxêv ên ji 15 heta 25 salî

Ciwanên ji 15 heta 25 salî yên ne fransîaxêv dikarin bi dirêjahiya salekê beşdarî polekê ya Dibistana Pêşwaziyê (École de l'Accueil - EdA) bibin. Ketin li gorî cihên berdest gengaz e. Li EdAyê, ciwan fransî hîn dibin, bi cihê xwe yê nû yê jiyanê re nas dibin û berdewamiya rêwîtiya xwe amade dikin. Tomarkirin li EdAyê li Portala Koçberiyê (Portail Migration) pêk tê:

- li gîşeyê, li qata 4ê ya Nivîsgeha Rênîşandana Dibistanî û Pîşeyî ya Kantonî (Office cantonal d'orientation scolaire et professionnelle - OCOSP)
- bi telefonê, ji Duşemê heta Pêncşemê ji 8h heta 12h
- bi rêya forma li ser înternetê ya Portail Migration.

Portail Migration bi gelek zimanan ciwanên bi eslê xwe koçber ên ku li perwerdeyekê digerin agahdar dike.

Portail Migration – Office cantonal d'orientation scolaire et professionnelle
Rue de la Borde 3d (qata 4ê 1014 Lausanne
Tel. 021 316 11 40, info.portail-migration@vd.ch, www.vd.ch/orientation
Duşem heta Pêncşem 8h-12h


Kursên ziman û çanda eslî

Zarokek ku bi zimanê xwe yê dayikê baş diaxive, hêsantir zimanekî din hîn dibe. Axaftina bi zimanê eslê xwe herwiha alîkariya avakirina nasnameya wî/wê û rêzgirtina ji xwe dike. Loma komele, dibistan û balyozxane kursên ziman û çanda eslî pêşkêş dikin. Hûn ê lîsteyeke van kursan di broşûra «Apprendre à Lausanne» («Fêrbûn li Lozanê») ya Nivîsgeha Koçberan ya Lozanê (Bureau lausannois pour les immigrés - BLI) de bibînin.

www.lausanne.ch/apal



Zarok û malbat



Gîşeya Agahdariya Malbatan (Guichet info familles) di xizmeta malbatan de ye da ku wan agahdar bike, pêşniyaran li wan bike û ber bi xizmetên cuda yên heyî rêbertiya wan bike, li gorî rewş û pêdiviyên wan.

Guichet info familles
Place Chauderon 9 (qata T), 1001 Lausanne
Tel. 021 315 66 50, info.familles@lausanne.ch, www.lausanne.ch/familles
Duşem heta Înê 8h30-11h30, 13h30-16h30 (Pêncşem berî nîvro girtî ye)

Pêşwaziya beriya dibistanê (0-4 salî)

Li Lozanê, zarokên ji 0 heta 4 salî dikarin li navendeke jiyana zarokan (Centre de vie enfantine - CVE) - jê re herwiha garderie an crèche tê gotin - bêne pêşwazîkirin.

Zarokên ji 14 hefteyî heta 12 salî dikarin herwiha li ba pêşwazîkerekê/î ya di derdora malbatî de (accueillante ou accueillant en milieu familial) bêne lênêrîn. Ev kesekî perwerdekirî ye ku li mala xwe zarokan diparêze. Pêşwazî takekesî ye û saet dikarin di navbera dêûbavan û vî kesî de bêne nîqaşkirin.

Ev xizmet bi heq in lê biha li gorî rewşa malbatî û hatiniyê tê adaptekirin.
Ji bo tomarkirinê, divê mirov formekê temam bike ku hûn ê li ser malpera www.lausanne.ch/inscription-prescolaire bibînin.

Guichet info familles
Place Chauderon 9 (qata T), 1001 Lausanne
Tel. 021 315 60 00, prescolaire@lausanne.ch, www.lausanne.ch/inscription-prescolaire
Duşem heta Înê 8h30-11h30, 13h30-16h30 (Pêncşem berî nîvro girtî ye)

Bala xwe bidinê!

Ji bo pêşwaziya li Navenda Jiyana Zarokan (Centre de vie enfantine) an li ba pêşwazîkerên di derdora malbatî de (accueillante ou accueillant en milieu familial) gelek daxwaz hene û dibe ku hûn neçar bimînin ku li benda cihekî bimînin. Hûn dikarin zarokê xwe pêşwext tomar bikin, ji meha 4ê ya ducaniyê ve an 1 sal berî dîroka pêşwaziyê ya ku hûn dixwazin. Ger hûn di lîsteya benda de bin, divê hûn her 6 mehan daxwaza xwe nû bikin.



Pêşwaziya demkî

Baxçeyên zarokan û qadên lîstikê

Baxçeyên zarokan û qadên lîstikê zarokan ji 2 sal û nîvî ve heta ketina dibistanê, bi tomarkirinê, pêşwazî dikin. Ew nîv-rojî vekirî ne, berî nîvro û piştî nîvro (bêyî pêşwaziya nîvro). Ev xizmet bi heq in lê biha li gorî rewşa malbatî û hatiniyê tê adaptekirin.

www.lausanne.ch/jardins-enfants

Qadên hevdîtinê yên dêûbav-zarok (Espaces rencontres parents enfants)

Qadên hevdîtinê ji bo zarokên ji 0 heta 4 salî ne, bi hevrêtiya mezinekê/î nêzîk. Pisporên perwerdeyê li wir in da ku we pêşwazî bikin. Ji bo zarokan û dêûbavên wan, ev derfetek e ku mirov bilîze û hevdîtinan bike.

www.lausanne.ch/espaces-rencontres

Baby-sitting

Hûn dikarin herwiha serî li baby-sittereke/î bidin da ku zarokê we li mala we biparêze. Xaça Sor (Croix-Rouge) dikare lîsteyeke baby-sitteran ji we re bişîne. Paşê hûn bi xwe têkiliyê bi kesê/a ku hûn hilbijêrin re datînin. Ji bo wergirtina vê lîsteyê, divê hûn beşdariyeke salane ya 57 fr. bidin.


www.croixrougevaudoise.ch/prestations/baby-sitting

Pêşwaziya paradibistanî (4 sal û zêdetir)

Pêşwaziya paradibistanî pêşkêşiyeke pêşwaziyê ye ji bo zarokan berî dibistanê, nîvro û piştî dibistanê. Li Lozanê, ji van cihan re APEMS (Pêşwaziyên ji bo zarokan di derdora dibistanî de - Accueils pour enfants en milieu scolaire) an UAPE (Yekîneyên pêşwaziyê ji bo xwendekaran - Unités d'accueil pour écolières et écoliers) tê gotin.

Zarokên heta 12 salî dikarin herwiha di pêşwaziya malbatî ya rojane de bêne lênêrîn (binêre r. 30).

Ev xizmet bi heq in lê biha li gorî rewşa malbatî û hatiniyê tê adaptekirin.





Ji bo 1P-2P (4-6 salî)

Li gorî taxan, zarok li APEMS an UAPEyan têne pêşwazîkirin. Ev cih hemû rojên hefteyê berî dibistanê, di nîvro de û piştî dibistanê vekirî ne. Tomarkirin li Guichet info familles pêk tê.

Guichet info familles
Place Chauderon 9 (qata T), 1001 Lausanne
Tel. 021 315 60 00, parascolaire.1-2p@lausanne.ch,
www.lausanne.ch/inscription-parascolaire
Duşem heta Înê 8h30-11h30, 13h30-16h30 (Pêncşem berî nîvro girtî ye)

Ji bo 3P-8P (6-12 salî)

- Ji bo 3P-6P (6-10 salî): zarok hemû rojên hefteyê berî dibistanê, di nîvro de û piştî dibistanê li APEMSan têne pêşwazîkirin.
- Ji bo 7P-8P (10-12 salî): zarok di nîvro de û piştî dibistanê têne pêşwazîkirin (ji bilî Çarşem piştî nîvro).

Ji bo tomarkirina zarokê xwe, divê mirov formeke ku li ser malpera www.lausanne.ch/parascolaire berdest e temam bike.

Service des écoles et du parascolaire - Inscription parascolaire
Place Chauderon 9 (qata 5ê), 1001 Lausanne
Tel. 021 315 64 11, apems@lausanne.ch, www.lausanne.ch/sep
Duşem heta Înê 8h30-11h30, 13h-16h30

Ji bo 9S-11S (12-15 salî)

Di navbera nîvro de, ciwan dikarin biçin refektorya saziya xwe ya dibistanî. Ew dikarin xwarina xwe bi xwe re bînin an xwarineke germ bi 8 fr. bikirin.

Xebatên spartekên bi piştgirî (devoirs accompagnés - DAC)

Zarok dikarin Duşem, Sêşem û Pêncşeman, di nîvro de an piştî dibistanê, alîkariyê ji bo kirina erkên xwe yên dibistanê wergirin. Jê re «spartekên bi piştgirî» (devoirs accompagnés - DAC) tê gotin. Gava erk biqedin, zarok azad e an dikare here pêşwaziya paradibistanî.

Ji bo tomarkirina zarokê xwe, divê mirov formeke ku li ser malpera www.lausanne.ch/parascolaire berdest e temam bike.

Service des écoles et du parascolaire - Inscription parascolaire
Place Chauderon 9 (qata 5ê), 1001 Lausanne
Tel. 021 315 64 11, sepdac@lausanne.ch, www.lausanne.ch/sep
Duşem heta Înê 8h30-11h30, 13h-16h30

Çalakiyên betlaneyê

Di betlaneyên dibistanê de, gelek çalakî ji zarokan re têne pêşkêşkirin. Mînak, kampên hefteyî an çalakiyên rojane. Biha li gorî hatiniya malbatan tê adaptekirin. Bernameya çalakiyan li ser rûpela www.lausanne.ch/activites-vacances berdest e.

Guichet info familles
Place Chauderon 9 (qata T), 1001 Lausanne
Tel. 021 315 68 22, activites.vacances@lausanne.ch
www.lausanne.ch/activites-vacances
Duşem heta Îne 8h30-1130, 13h30-16h30 (Pêncşem berî nîvro girtî ye)


Alîkariyên aborî ji bo zarokên li dibistanê

Dêûbavên ku zehmetiyên aborî hene dikarin daxwaza alîkariyan (subside) ji bo xwarinên li refektorya dibistanê, spartekan an kampên betlaneyê bikin. Ji bo kirina daxwazê, divê mirov formeke ku li ser înternetê li ser www.lausanne.ch/aide-financiere-ecole berdest e temam bike. Hûn ê wê herwiha rasterast li sekreteriya dibistanan bibînin. Alîkarê/a civakî yê dibistanê dikare, ger pêwîst be, alîkariya we bike ku hûn formê temam bikin. Paşê divê daxwaz ji Servîsa Dibistan û Paradibistanî (Service des écoles et du parascolaire) re bê şandin.

Service des écoles et du parascolaire (SEP)
Place Chauderon 9 (qata 5ê), 1001 Lausanne
Tel. 021 315 64 11, scolarite@lausanne.ch, www.lausanne.ch/sep
Duşem heta Îne 8h30-11h30, 13h-16h30

Baş e ku mirov bizanibe

Alîkariyên aborî yên din di beşa «Budce, bac û telekomunîkasyon» de têne pêşkêşkirin. Mînak alîkariyên malbatî (allocations familiales) û alîkariya komînî ya jidayikbûnê an pejirandinê (allocation communale de naissance ou d'adoption) (binêre r. 59-60).



Zewac û rewşa medenî

Rewşa medenî

Pirsên we li ser zewacekê, jidayikbûnekê, guhertina nav an paşnavekî an mirinekê hene? Hûn ê agahiyan li ser www.vaud-bienvenue.ch an li ser malpera Rewşa Medenî ya kantona Vaudê (État civil du canton de Vaud) bibînin.

État civil du Canton de Vaud – Service de la population
Avenue de Sévelin 46, 1004 Lausanne
Tel. 021 557 07 07 (Duşem heta Înê 8h30-11h30), www.vd.ch/etat-civil
Duşem heta Înê 8h-16h30


Gihandina malbatê


Ger hûn li Swîsreyê bijîn û bixebitin, hûn dikarin endamên malbata xwe bînin. Mînak, hevjîna/ê xwe an zarokên xwe. Jê re daxwaza gihandina malbatê tê gotin. Ev ne otomatîk e. Divê hin şert bêne cîbicîkirin.

- Ger hûn ji UE/AELEyê tên: daxwazê li ba Servîsa Kontrola Şêniyan bikin (Service du contrôle des habitants) (binêre r. 17).
- Ger hûn ji Dewleteke sêyemîn tên: serî li balyozxane an konsolosxaneya swîsrî ya welatê xwe bidin.

Ev sazî daxwaza we ji Servîsa Nifûsê ya kantona Vaudê (Service de la Population du canton de Vaud) re dişînin, ku biryarê digire.

Bala xwe bidinê!
Ger hûn ji Dewleteke sêyemîn tên, maweya we ya 5 salan heye ku hûn hevjîna/ê xwe an zarokên xwe yên di bin 12 saliyê de bînin. Ji bo zarokên di navbera 12 û 18 saliyê de, mawe tenê 1 sal e.





Pirrengiya zayendî û ya zayenda civakî: LGBTIQ+

Mafê her kesî heye ku nasnameya xwe ya zayenda civakî û meyla xwe ya zayendî û hestyarî bi serbestî û bêyî cudakariyê îfade bike. Kesekî çavkanî li Bajarê Lozanê di xizmetê de ye da ku bersivê bide pirsên we: www.lausanne.ch/lgbtiq.

Herwiha gelek komele hene ku ji aliyê kesên LGBTIQ+ ve û ji bo wan hatine avakirin.

- **Check Point, L-Check, Pôle trans :** navenda tenduristiyê ya civakî.
  www.profa.ch/checkpoint
- **Ekivock :** ji bo kesên nasnameya zayendî ya nebînar (ne dubeş).
  www.ekivock.ch
- **Familles arc-en-ciel :** ji bo malbatên LGBTIQ+.
  www.regenbogenfamilien.ch
- **Fondation Agnodice :** ji bo ciwanên di bin 18 saliyê de yên transgender, nebîner an di pirsyariyê de, û dêûbav an nêzîkên wan.
  www.agnodice.ch
- **Lilith :** ji bo kesên lezbiyen, biseksuel, transgender, nebîner û queer.
  www.associationlilith.ch
- **Rainbow Spot :** ji bo kesên koçber ên LGBTIQ+ (binêre r. 11).
  www.rainbowspot.ch
- **VoQueer :** komeleya Vaudê ji bo pirrengiya zayendî û ya zayenda civakî.
  www.voqueer.ch

Zewaca bi zorê

Tê hesibandin ku zewaca bi zorê heye ger kesek nikaribe zewicandinê red bike. Li Swîsreyê, mafê her kesî heye ku biryarê bide ka ew dizewice an na û bi kê re dizewice. Ji bo qurbanî an şahidên zewaceke bi zorê, Nivîsgeha Entegrasyona Biyaniyan û Pêşîlêgirtina Nijadperestiyê ya Kantonî (Bureau cantonal pour l'intégration et la prevention du racisme - BCI) şêwirdariyên belaş û nependî bi randevû pêşkêş dike. Hûn dikarin daxwaza agahiyan bikin an bi telefon an e-nameyê randevûyekê bigirin. Ger pêwîst be, wergêrek dikare alîkariya we bike.

Bureau cantonal pour l'intégration des étrangers et la prévention du racisme (BCI)
Tel. 021 316 40 16, amina.benkais-benbrahim@vd.ch, www.vd.ch/mariage-si-je-veux

Cudabûn, berdan

Hûn dixwazin ji hev cuda bibin an berdanê bikin? Rêbera www.se-quitter.ch we li ser kar û barên ku divê bêne şopandin, li gorî rewşa we, agahdar dike. Nivîsgeha Agahdariya Jinan (Bureau Information Femmes - BIF) servîseke belaş, nependî, nenas û bi gelek zimanan berdest pêşkêş dike, ku ji jinan û mêran re li Maison de la Femme gihîştî ye.

Maison de la Femme
Avenue Eglantine 6, 1006 Lausanne
Tel. 021 323 33 22, info@maisondelafemme.ch, www.maisondelafemme.ch

Tundiya malbatî

Tundiya malbatî li Swîsreyê qedexe ye. Ew dikare tundiya fizîkî, zayendî, psîkolojîk an aborî be. Ji bo her rewşeke krîzê, li 142ê bigerin.

www.aide-aux-victimes.ch

Va ye herwiha lîsteyeke pisporan ku alîkariya kesên şahid an qurbanên tundiya malbatî dikin.

Navendên pêşwazî û alîkariyê ji bo qurbanan

- Centre LAVI Vaud: ev navend kesan bi awayekî nependî û belaş bi gelek zimanan pêşwazî dike da ku li ser rewşa xwe biaxivin û wan li ser mafên wan agahdar bike. Ew dikare alîkariyeke awarte bide, mînak cihekî mayînê an şêwirdariyeke bijîşkî. Ew herwiha hevrêtiyeke hiqûqî, aborî an bijîşkî li gorî pêdiviyan pêşkêş dike.

  Centre LAVI Vaud
  Rue du Grand-Pont 2 bis, 1003 Lausanne
  Tel. 021 631 03 00, www.lavi-vaud.ch
  Duşem heta Sêşem 8h30-12h, 14h-17h, Çarşem heta Înê 8h30-12h

- Centre d'accueil Malley-Prairie: ev cihê pêşwaziyê 24 saetan û 7 rojan vekirî ye. Ew şêwirdariyên belaş û nependî pêşkêş dike. Ew dikare herwiha jinan û zarokên wan di cihekî mayînê yê awarte de pêşwazî bike.

  Centre d'accueil Malley-Prairie
  Chemin de la Prairie 34, 1007 Lausanne
  Tel. 021 620 76 76, info@malleyprairie.ch, www.malleyprairie.ch
  24 saetan / 7 rojan

Şêwirdariya bijîşkî

- Yekîneya Bijîşkiya Şîddetê ya CHUVê (Unité de médecine des violences du CHUV): ev yekîne şêwirdariyeke bijîşkî-hiqûqî ya belaş ji bo mezinên qurbanên şîddetê pêşkêş dike. Ew pêşwazî, guhdarî û muayeneyeke klînîkî pêşkêş dike. Ev muayene ji bo çêkirina raporeke lêdan û birînan xizmetê dike. Ew dikare ji bo qurbanê bikêr be ger ew bixwaze mafên xwe bi kar bîne.

  Unité de médecine des violences CHUV
  CHUV, pêşwaziya Awarteyan, rue du Bugnon 44, 1011 Lausanne
  Tel. 021 314 00 60, curml.central@chuv.ch, www.curml.ch
  Duşem heta Înê 8h-12h, 14h-16h, dawiya hefteyê û rojên fermî 8h-12h

Navenda pêşîlêgirtinê ji bo kirdeyên kirinên şîddetê

- Centre Prévention de l'Ale: ev navend bi kesên ku di jiyana xwe ya hevjînî de tevgereke êrîşkar an şîddetkar hene re dimeşe. Ew alîkariya her kesê mezin dike ku dixwaze dev ji tevgera bi şîddetê berde.

  Centre Prévention de l'Ale
  Rue de l'Ale 30, 1003 Lausanne (ketin ji rue de la Tour 29)
  Tel. 021 321 24 00, cpale@malleyprairie.ch, www.prevention-ale.ch
  Duşem heta Înê 8h-12h, 13h-17h (Çarşem heta 19h)



Kalemêr û pîrejin

Délégation aux seniors konferansan ji bo pîrên nû organîze dike û merasîmeke salane di dema derbasbûna teqawidiyê de. Ew herwiha broşûrekê li ser pêşkêşiyên perwerdeyên komputerê diweşîne. Hûn ê hemû agahiyan li ser rûpela www.lausanne.ch/seniors bibînin.

Délégation aux seniors
Tel. 021 315 72 87, seniors@lausanne.ch, www.lausanne.ch/seniors

Agahî û hevrêtî

Gelek komeleyên piştgiriya pîran jî li wir in da ku we agahdar bikin û çalakiyan pêşkêş dikin. Va ne yên sereke.

AVIVO Vaud


AVIVO alîkariya we ji bo kar û barên îdarî dike û we li ser xizmetên civakî û çavkaniyên berdest agahdar dike. Komele herwiha piştgiriyeke civakî pêşkêş dike û gelek çalakiyên werzîşî û çandî organîze dike.

AVIVO Vaud
Place Chauderon 3 (qata 5ê), 1003 Lausanne
Tel. 021 312 06 54, info@avivolausanne.ch, www.avivo-vaud.ch
8h30-11h30, 13h30-16h30, Sêşem 8h30-11h30

EPER – Âge et Migration

Komeleya EPER piştgiriyê dide kesên teqawidbûyî yên ji koçberiyê tên. Ew nobedariyên civakî-îdarî bi randevû organîze dike, mînak ji bo pirsên girêdayî teqawidiyê an sîgorteyên civakî. Ew herwiha çalakiyên werzîşî û çandî pêşkêş dike.

EPER
Route des Plaines-du-Loup 55, 1018 Lausanne
Tel. 021 613 40 70, info@eper.ch, www.eper.ch/age-et-migration



Info Seniors Vaud

Info Seniors ya Pro Senectute Vaud servîseke pêşwazî û agahdariyê ya belaş û nependî ye ji bo kesên ji 60 salî ve. Mînak, ji bo her pirsa girêdayî teqawidiyê, tenduristiyê û warê civakî. Platformeke înternetê jî di xizmetê de ye.

Info Seniors Vaud
Place de la Riponne 5, 1005 Lausanne
Tel. 021 641 70 70, info@infoseniorsvaud.ch, www.infoseniorsvaud.ch
Duşem, Sêşem û Pêncşem 9h-12h, 13h30-16h (an bi randevû)

Pro Senectute Vaud

Pro Senectute şîret û alîkariyeke belaş ji bo pirsên girêdayî teqawidî û pîrbûnê pêşkêş dike. Mînak alîkarî ji bo kar û barên îdarî, seredanên li malê û çareseriyên xaniyên adaptekirî. Pro Senectute herwiha çalakiyên werzîşî û çandî, xwarin, derketin û konferansan pêşkêş dike.

Pro Senectute Vaud
Tel. 021 646 17 21, info@vd.prosenectute.ch, www.vd.prosenectute.ch

Vala dem û çalakiyên fizîkî

Gelek komele çalakiyan ji bo pîran pêşkêş dikin. Mînak, komeleyên ku li jor hatine pêşkêşkirin. Va ne çend navnîşanên zêde:

- Mouvement des Aînés hilbijartineke berfireh a çalakiyan pêşkêş dike. Mînak, kursên werzîşê, gerên derve, perwerde, rêwîtî, hwd.
  www.mda-vaud.ch
- Connaissances 3 Zanîngeha pîran e. Ew ji her kesî re vekirî ye, temen an asta perwerdeyê çi be jî.
  wp.unil.ch/connaissance3
- Hin malên taxê (maisons de quartier) bernameyeke ji bo pîran jî hene (binêre r. 63).
- Bajarê Lozanê gelek kursên werzîşê yên belaş an bi bihayên kêm pêşkêş dike. Hin ji wan bi taybetî ji bo pîran hatine amadekirin (binêre r. 62).

Hûn ê lîsteyeke komeleyên nêzîkî mala xwe li ser www.guide-seniors.ch bibînin.

Baş e ku mirov bizanibe

Kesên teqawidbûyî pir caran ji bihayên kêmkirî di muze, sînema, navendên werzîşê, hwd. de sûd werdigirin.

Tevgerî

Pêşkêşiyên cuda hene da ku tevgera pîran hêsan bikin. Em li vir çend xizmetên heyî pêşkêşî we dikin.

Veguhastina giştî

Abonmana salane ya veguhastina giştî ji bo herêma Lozanê (zon 11 û 12) ji bo kesên teqawidbûyî nîvbiha ye. Ew ji bo kesên ku ji xizmetên temamker ên AVS/AI sûd werdigirin belaş e.

www.lausanne.ch/rabais-tl

Alîkariyên tevgerê

Kesên bi tevgera sînordar dikarin daxwaza alîkariyê ji bo tevgerên xwe bikin (binêre r. 56).


Veguhastina taybet

Service d'entraide bénévole veguhastinên taybet li nav Lozanê ji bo pîran pêşkêş dike. Divê mirov daxwazê herî kêm 48 saetan pêşwext bi telefonê bike. Veguhastin ji bo her rêwîtiyekê 8 fr. e.

Service d'entraide bénévole
Tel. 021 312 42 11, info@seb-lausanne.ch, www.seb-lausanne.ch
Duşem-Înê 9h-11h

Baş e ku mirov bizanibe

Lênêrîn û alîkariyên li malê di rûpela 50 de têne pêşkêşkirin.



Seqetî

Gelek komele piştgiriyê didin kesên ku bi seqetiyê ve têkildar in. Em li vir çend komeleyên giştî pêşkêşî we dikin. Ew we agahdar dikin û li gorî rewşa we rêbertiya we dikin.

Pro Infirmis bi kesên xwedî seqetiyeke fizîkî, kêmasiyeke aqilî an nexweşiyên derûnî re, û herwiha bi nêzîkên wan re dimeşe. Komele şêwirdariyên civakî pêşkêş dike û li gorî rewşa kesan alîkariyên aborî dide.

Pro Infirmis Vaud
Rue du Grand Pont 2bis, 1003 Lausanne
Tel. 058 775 34 34, vaud@proinfirmis.ch, www.proinfirmis.ch

Ji bo kesên kêmasiya aqilî

Insieme Vaud komeleyeke dêûbav û nêzîkên ku bi seqetiya derûnî ve têkildar in e. Ew piştgiriyê dide, agahdar dike û mafên kesên di rewşa seqetiyê de û herwiha malbatên wan diparêze. Komele herwiha çalakî û kampên vala demê organîze dike û komên axaftinê ji bo nêzîkan pêşkêş dike.

insiemevaud.ch

Ji bo kesên otîst

Autisme Suisse romande komeleyeke piştgiriya kesên otîst û nêzîkên wan e. Ew li ser çavkaniyên berdest agahdar dike. Mînak çareseriyên lênêrînê, alîkariyên li malê, xwendina dibistanê, perwerde, vala dem, hwd.

www.autisme.ch

Ji bo kesên bi kêmasiya dîtinê

UCBA komeleyên piştgiriya kesên kor, kêmdîtin û kêmbihîst-kêmdîtin kom dike. Ew kesan agahdar dike û piştgiriya serxwebûna wan dike. Ew herwiha perwerde û vala demên adaptekirî ji bo kesên kêmbihîst-kêmdîtin pêşkêş dike.

www.ucba.ch

Katalogeke li ser înternetê herwiha derfetê dide we ku hûn hemû xizmetên di xizmeta kesên di rewşa kêmasiya dîtinê de bibînin, li gorî cih, temen û pêdiviyan.

www.offres-malvoir.ch


Ji bo kesên ker û kêmbihîst

Pôle Audition Surdité platformeke li ser înternetê ye ku çavkaniyên di xizmeta kesên ker an kêmbihîst û derdora wan de kom dike. Mînak, li ser tenduristiyê, perwerdeyê, kar, dadmendiyê, gihîştinê an vala demê. Kataloga wê ya înternetê derfetê dide we ku hûn agahiyan li gorî rewşa xwe, pêdiviyên xwe, cihê xwe yê jiyanê û temenê xwe bibînin.

www.audition-surdite.ch

Baş e ku mirov bizanibe

Bajarê Lausanne gihîştina gelek avahiyan ji bo kesên bi temen an di rewşa seqetiyê de yên ku di tevgerê de zehmetî dikişînin hêsan dike. Lîsteyeke van avahiyan li ser malpera www.lausanne.ch/accessibilite heye. Herwiha alîkariyên veguhastinê ji bo kesên bi tevgera sînordar hene (binêre r. 56).



Sîgorte

Sîgorte parastinek e li hember rîskekê: kes primekê dide ku alîkariyeke aborî jê re garantî dike ger pirsgirêk pêk were. Hin sîgorte bi dilxwazî ne û hin din mecbûrî ne.

Sîgorteyên civakî mecbûrî ne. Ew di qanûnê de hatine nivîsandin û kesên ku li Swîsreyê dijîn û dixebitin diparêzin. Ew mînak van digirin nav xwe: pîrbûn, nexweşî, seqetî, dayikbûn, qeza, jidestdayîna qezencê an bêkarî.

www.ahv-iv.ch/assurances-sociales

Di vê beşê de, em sîgorteyên sereke pêşkêşî we dikin. Ger pirsên we li ser sîgorteyên civakî hebin, hûn dikarin serî li Ajansa Sîgorteyên Civakî (Agence d'assurances sociales) bidin.

Agence d'assurances sociales
Place Chauderon 7, 1001 Lausanne
Tel. 021 315 71 00, www.lausanne.ch/aides-assurances-sociales
Duşem heta Înê 8h30-11h45, 13h-16h30 (Pêncşem berî nîvro girtî ye)

Sîgorteya nexweşiyê ya mecbûrî (Assurance-maladie obligatoire - LAMal)

Li Swîsreyê, sîgorteya nexweşiyê mecbûrî ye. Ev sîgorte derfetê dide we ku hûn bigihîjin sîstema tenduristiyê û lênêrînên bi kalîte, bi dayîna tenê beşek ji mesrefan. Gava hatina we, maweya we ya 3 mehan heye ku hûn peymanekê bi sindoqeke sîgorteyê ya swîsrî re îmze bikin. Gelek sindoqên sîgorteyê hene û hûn dikarin bi serbestî hilbijêrin. Sindoqa sîgorteyê mecbûr e ku daxwaza we qebûl bike. Ji bo hilbijartinê, nemaze binêrin ka prîm çiqas e (ew tiştê ku hûn her meh ji bo sîgorteyê didin). Ger hûn hewceyî alîkariyê bin, serî li berawirdkerên li ser înternetê wek www.priminfo.ch bidin an biçin Ajansa Sîgorteyên Civakî (Agence d'assurances sociales) (li jor binêre).

Hûn dikarin peymana xwe ya sîgorteya nexweşiyê ya mecbûrî her sal ji bo sala pêş biguherînin, berî 30ê Mijdarê. Divê ev daxwaz bi nivîskî bê kirin.

Bala xwe bidinê!
Divê hûn ji roja hatina xwe ya Swîsreyê ve prîmên sîgorteya nexweşiyê ya mecbûrî bidin. Ger hûn wê tavilê nekin, hûn dîsa jî neçar in prîmên hefteyên berê bidin. Fatûre dikare zêde be.

Baş e ku mirov bizanibe
Divê kesên bêbelge jî sîgorteya nexweşiyê hebe. Sîgorte nikarin agahiyan li ser wan bidin. Ew bi razê pîşeyî ve girêdayî ne.

Alîkariya sîgorteya nexweşiyê ya mecbûrî

Prîmên sîgorteya nexweşiyê ya mecbûrî dikarin li gorî meaşê we û hejmara kesên di bin barê we de mesrefeke girîng pêk bînin. Nivîsgeha Vaudê ya Sîgorteya Nexweşiyê (Office vaudois de l'assurance-maladie - OVAM) alîkariyeke aborî dide kesên ku hewceyî wê ne. Ji vê alîkariyê re subside tê gotin. Hûn dikarin mafê xwe yê subsideyê binirxînin û daxwazekê li ser malpera www.vd.ch/subside-assurance-maladie bidin.

Sîgorteyên nexweşiyê yên temamker


Hin dermankirin, wek bijîşkiya xwezayî an bijîşkiya diranan, ji aliyê sîgorteya nexweşiyê ya mecbûrî ve nayên vegirtin. Loma hûn dikarin hilbijêrin ku yek an gelek sîgorteyên temamker hebin. Ev sîgorte bi dilxwazî ne: hûn ne mecbûr in ku hûn yekê bigirin û sindoqa sîgorteyê azad e ku daxwaza we qebûl bike an red bike. Loma tê pêşniyarkirin ku hûn zarokên xwe pir zû sîgorte bikin û berî ku hûn peymana xwe betal bikin baş bifikirin.

Sîgorteya qezayê ya mecbûrî (Assurance-accident obligatoire - LAA)

Ger hûn bixebitin, sîgorteya qezayê ji aliyê kardêrê/a we ve tê dayîn. Ew van digire nav xwe:

- Qezayên pîşeyî û ne-pîşeyî: ger hûn zêdetirî 8 saetan di hefteyê de li ba kardêrekê/î bixebitin.
- Tenê qezayên pîşeyî: ger hûn kêmtirî 8 saetan di hefteyê de li ba kardêrekê/î bixebitin.

Ger hûn serbixwe bin an bêkar bin, divê hûn xwe bi xwe sîgorte bikin.



Sîgorteyên civakî yên din

Li Swîsreyê, sîgorteyên civakî yên jêrîn hatiniyekê di temenê teqawidiyê de, di rewşa pirsgirêkeke tenduristiyê, maweyeke bêkarî an zehmetiyên aborî de garantî dikin. Ew beşek ji aliyê kesê xebatkar ve û beşek ji aliyê kardêrê/a wî/wê ve têne dayîn. Beşdarî ji meaş têne kêmkirin. Hûn dikarin wê li ser fşa meaşê xwe bibînin. Va ye lîsteyeke van sîgorteyan:

- **AVS (1er pilier) – Sîgorteya pîrbûn û mayîndeyan (Assurance-vieillesse et survivants):** ew ji bo her kesê/a ku li Swîsreyê dijî an dixebite mecbûrî ye. Ew kêmtirîna jiyanî ji bo teqawidiya we garantî dike.
- **LPP (2e pilier) – Pêşbîniya pîşeyî (Prévoyance professionnelle):** ew ji 22'680 fr. hatiniya salane ve mecbûrî ye. Ew AVSê temam dike da ku asteke jiyanê ya çêtir di teqawidiyê de garantî bike.
- **AC – Sîgorteya bêkariyê (Assurance chômage):** ew we diparêze ger hûn kara xwe winda bikin an jê derkevin.
- **APG – Alîkariyên windakirina hatiniyê (Assurance perte de gain):** ew garantî dike ku hûn di rewşa xizmeta leşkerî an destûra dayikbûn û bavbûnê de berdewam hatiniyekê wergirin.
- **AI – Sîgorteya seqetiyê (Assurance-invalidité):** ew we di rewşa pirsgirêkeke tenduristiyê ya demdirêj de diparêze.
- **PC – Xizmetên temamker (Prestations complémentaires):** ew bi awayekî aborî alîkariya we dikin ger hatiniyên we pêdiviyên jiyanî nagirin.
- **Alîkariyên malbatî (Allocations familiales):** ev alîkariyên aborî ne ji bo her zarokekî, li ser daxwazê (binêre r. 59).

Bala xwe bidinê!

Divê şêniyên Lozanê bi awayekî mecbûrî apartmana xwe û mal û milkên xwe li hember şewat û karesatên sirûştî li ba ECAyê sîgorte bikin (binêre r. 18).


Sîgorteya berpirsiyariya medenî (Assurance responsabilité civile - RC) û sîgorteya malê (Assurance ménage)

Sîgorteya malê, mal û milkên we yên madî diparêze. Mînak di rewşa dizî an şewatê de. Sîgorteya berpirsiyariya medenî (RC) we diparêze ger hûn berpirsiyarê zirarekê bin ku li kesekî din hatiye kirin. Mînak ger hûn qezayekê çêbikin an tiştekî di apartmana ku hûn bi kirê digirin de xera bikin. Ev 2 sîgorte bi giştî bi hev re têne kombûn. Ew bi dilxwazî ne lê pir caran ji aliyê gerancan ve têne xwestin.

Sîgorteyên din ên ne-mecbûrî

Hîn sîgorteyên din jî hene ji bo mal û pêdiviyên taybet. Ev sîgorte bi dilxwazî ne, lê têne pêşniyarkirin. Ew we li hember surprîzên xerab diparêzin. Mînak:

- **Sîgorteya wesayîtê:** di rewşa xerabûn, qeza û zirarên cuda yên li ser wesayîta we de.
- **Sîgorteya jiyanê(Assurance vie):** wek temamkerê AVSê û stûna 2yem (beşdarî ji bacan têne kêmkirin).
- **Sîgorteya rêwîtiyê:** ger hûn neçar bimînin rêwîtiyekê betal bikin, bagaja xwe winda bikin an li derveyî welêt pirsgirêkeke tenduristiyê hebe.
- **Sîgorte ji bo heywanan:** ger hûn neçar bimînin heywanê xwe yê malê bidin dermankirin.
- **Alîkariya hiqûqî:** di rewşa pirsgirêkeke bi qanûnê re.



Tenduristî

Bala xwe bidinê!
Ji bo xwe û ji bo hemû endamên malbata xwe herî zû sîgorteyeke nexweşiyê ya mecbûrî çêbikin, herî dereng di nav 3 mehên piştî hatina we ya Swîsreyê de (binêre r. 43-44).

Pirsgirêka tenduristiyê: divê mirov çi bike?

Di rewşa awarteyeke jiyanî de:
- biçin nexweşxaneyê (Service des urgences)
- li 144ê bigerin ji bo ambulansekê.

Ger awarteyeke jiyanî tune be, hûn dikarin:
- Biçin dermanxaneyê û pêşniyaran ji dermanxanevanekê/î bixwazin.
- Bi bijîşkê/a xwe yê giştî randevûyekê bigirin, ger pêwîst be berê we dide pisporekê/î.
- Gava dermanxane û muayenexaneya bijîşkê we yê giştî girtî bin, li navenda telefonê ya bijîşkên nobedar li 0848 133 133 bigerin.


Baş e ku mirov bizanibe
Kesên bêbelge de dikarin biçin nexweşxaneyê an daxwaza lênêrînê bikin bêyî rîska ku bêne îxbarkirin an vegerandin. Ew ji aliyê raza pîşeyî ya bijîşkî ve têne parastin.

Dermanxane

Dermanxane dermanan difiroşin û dikarin pêşniyarên tenduristiyê yên bingehîn jî bidin. Saetên wan ên vekirinê bi giştî bi yên dikanan re li hev tên. Hin dermanxane Yekşeman û heta dereng êvarê vekirî ne: ji wan re dermanxaneyên nobedar tê gotin.
www.garde.svph.ch

Bijîşkên giştî

Li Swîsreyê, hûn dikarin bijîşkekê/î giştî hilbijêrin. Ev kes dosyeya we ya bijîşkî dişopîne û ger pêwîst be berê we dide pisporan. Hûn dikarin li bijîşkekê/î ku bi zimanê we diaxive bigerin. Civata Bijîşkiyê ya Vaudê (Société vaudoise de médecine) lîsteyeke bijîşkan pêşkêş dike û zimanên ku ew pê diaxivin diyar dike. Berî ku hûn têkiliyê bi bijîşkekê/î re deynin, kar û bar û mercên sîgorteya xwe kontrol bikin.
www.svmed.ch/trouver-un-medecin



Nexweşxaneyên Lozanê

Li Lozanê, gelek saziyên bijîşkî lênêrînên bi kalîteya bilind pêşkêş dikin. Va ne 3 navnîşanên girîng:

- Centre hospitalier universitaire vaudois (CHUV)
  Rue du Bugnon 46, 1011 Lausanne (ketina awarteyan li hejmara 44)
  Tel. 021 314 11 11, www.chuv.ch
- Unisanté – Biopôle
  Route de la Corniche 21, 1010 Lausanne
  Tel. 021 314 60 60, www.unisante.ch
- Hôpital de l'Enfance : navenda pediatrîk
  Rue du Bugnon 50, 1011 Lausanne (ketina awarteyan li hejmara 52)
  Tel. 021 314 84 84, www.chuv.ch/hopital-enfants

Herwiha nobedarî, klînîk û nexweşxaneyên din jî hene. Hin ji wan servîsên awarte pêşkêş dikin. Hûn ê lîsteya van navendên awarte û rêjeya dagirtina wan li ser www.medigo.ch/situationactuelle an li ser sepana mobîl a Medigo bibînin.

Dayikbûn û Bavbûn

Hûn ê di demeke nêz de bibin dayik an bav? Lênêrînên bijîşkî yên girêdayî ducaniyê ji aliyê jinolojîstan û pîrikan ve têne dayîn. Mesref ji hefteya 12em a ducaniyê ve ji aliyê sîgorteya nexweşiyê ya mecbûrî ve têne vegirtin. Di jidayikbûna zarokî de, mafê dayikê heye ku 14 hefteyan destûra dayikbûnê bistîne. Ew di vê maweyê de 80% ji meaşê xwe distîne. Mafê dêûbavê duyem heye ku 2 hefteyan destûra bi heq bistîne. Divê ew vê destûrê di nav 6 mehên piştî jidayikbûnê de bigire.

Piştgiriya jidayikbûna pirzimanî

Komeleya Panmilar piştgiriyekê, bi zimanê we, di dema ducaniyê de û piştî jidayikbûna zarokê we pêşkêşî we dike. Ew ji aliyê pîrejinan û wergêrên civakî ve tê pêşkêşkirin. Ev derfetek e ku hûn dêûbavên din ên pêşerojê nas bikin, pirsên xwe bikin û xwe amade bikin ku hûn zarokê xwe pêşwazî bikin.

Association Panmilar
Rue Pré-du-Marché 23, 1004 Lausanne
Tel. 077 410 20 24, secretariat@panmilar.ch, www.panmilar.ch
Duşem, Sêşem, Pêncşem û Înê 9h-12h

Hemşîreyên zarokatiya biçûk

Hemşîreyên zarokatiya biçûk hevdîtinên dêûbav-zarok ên belaş û bêyî randevû ji bo zarokên ji 0 heta 4 salî pêşkêş dikin. Dêûbav dikarin agahî û piştgiriyê wergirin. Ev şêwirdarî her hefte li taxên cuda têne organîzekirin. Hûn ê cih û saetan li ser rûpela înternetê ya www.cms-vaud.ch/rencontres-parents-enfants bibînin.

Tenduristiya zayendî


Weqfa PROFA Lozanê navnîşana referansê ye ji bo hemû pirsên tenduristiya zayendî, hevjîniyê, seksolojiyê û perînatalîteyê. Ew hevdîtinên pêşniyaran û şêwirdariyên bijîşkî (bi randevû) pêşkêş dike. Nêzîkatiya wê nependî ye, li gorî her rewşê hatiye adaptekirin, bêyî cudakarî û dadbariyê.

Fondation PROFA
Avenue Georgette 1, 1003 Lausanne
Tel. 021 631 01 42, www.profa.ch

Tenduristiya derûnî

Komeleya Appartenances şêwirdariyên psîkoterapîk û psîkiyatrîk ji bo kesên koçber û nêzîkên wan pêşkêş dike. Mînak di rewşa nexweşiyên girêdayî rêwîtiya koçberiyê, jiyaneke şer an îşkenceyê, an her cureyeke din a tundiya kolektîf de. Wergêrekê/î civakî dikare, ger pêwîst be, hevdîtinan wergerîne.

Consultation Psychothérapeutique pour Migrantes et Migrants – Appartenances
Rue des Terreaux 10 (qata 3ê), 1003 Lausanne
Tel. 021 341 12 50, cpm.lausanne@appartenances.ch, www.appartenances.ch



Lênêrîn û alîkariyên li malê

Fondation Soins Lausanne alîkariyên li malê di warên cuda de pêşkêş dike:


- **Tenduristî û lênêrîn:** lênêrînên paqijiyê, lênêrînên hemşîretiyê, nûvejandin li malê.
- **Piştgirî ji bo jiyana rojane:** alîkariya kirînê, lênêrîna xanî, veguhastin ji bo kesên bi tevgera sînordar, xwarin, nobedarî û amadebûn li malê.
- **Piştgiriya psîko-civakî:** piştgiriya nêzîkan, guhdarî, şîret û hevrêtî di maweya dijwar de an ji bo kar û barên îdarî.

Her kesê/a ku di tenduristiya xwe de ziyan dîtiye (nexweşî, seqetî, qeza) dikare daxwaza alîkariyê bike. Ji bo vê, divê hûn têkiliyê bi navenda bijîşkî-civakî (Centre medico-social - CMS) ya herî nêzîkî mala xwe re deynin. Pisporek bi we re pêdiviyên we dinirxîne.

Fondation Soins Lausanne (Centres médico-sociaux - CMS)
Rue St-Martin 20, 1003 Lausanne
Tel. 021 213 02 33, cms.lausanne.centre@avasad.ch,
www.cms-vaud.ch

Baş e ku mirov bizanibe

Bajarê Lausanne bi belaş tûrikên çopê yên bi bac ji bo kesên ku ji nekontrolkirina mîzê diêşin, li ser pêşkêşkirina belgeyeke bijîşkî, belav dike.
www.lausanne.ch/sac-incontinence



Alîkariya civakî ya awarte

Li Lozanê, gelek alîkariyên belaş an bi bihayên kêm ji bo kesên di rewşa nesteqbariyê de hene. Hin cih cihê mayînê yê belaş ji bo şevê an pêşwaziyeke rojane pêşkêş dikin. Herwiha cih hene ku mirov lê xwe bişo, cilên xwe bişo, lênêrînê wergire, alîkariyeke xwarinê bistîne an jî tiştên destduyem bi bihayên kêm bikire. Hûn ê agahiyên bikêrhatî li ser rûpela înternetê ya Bajarê Lozanê bibînin.

www.lausanne.ch/aide-urgence

Malên taxê, komeleyên piştevanî an Nivîsgeha Koçberan ya Lozanê (Bureau lausannois pour les immigrés - BLI) jî dikarin agahiyan bidin we.

Alîkariya xwarinê

Soupe populaire her êvar ji 19h30 heta 21h30 û di nîvro de ji Çarşemê heta Yekşemê, ji 12h heta 13h30, xwarinên germ ên belaş pêşkêş dike. Soupe populaire ji her kesî re bêyî şertan vekirî ye.

Soupe populaire – Fondation Mère Sofia
Rue Saint-Martin 12, 1003 Lausanne
Tel. 078 626 43 22, soupe@meresofia.ch, www.meresofia.ch/la-soupe-populaire
Her êvar 19h30-21h30 û Çarşem heta Yekşem 12h-13h30

Baş e ku mirov bizanibe

Hin malên taxê herwiha belavkirinên xwarinê an xwarinên piştevaniyê organîze dikin. (binêre r. 63).

Tenduristî û paqijî

Weqfa Point d'Eau Lausanne xizmetên tenduristî û paqijiyê bi bihayên kêm ji bo kesên di nesteqbariyê de pêşkêş dike. Personelên hemşîretiyê, diranbijîşk, bijîşk û pisporên din şêwirdariyan didin. Herwiha gengaz e ku mirov serê xwe bişo, cilên xwe bişo an porê xwe bide birîn. Point d'Eau herwiha rênîşandaneke civakî û alîkariyeke hiqûqî pêşkêş dike.

Point d'Eau Lausanne
Avenue d'Echallens 123, 1004 Lausanne
Tel. 021 626 26 44, info@pointdeau-lausanne.ch, www.pointdeau-lausanne.ch
Duşem 13h-19h, Sêşem heta Înê 10h-16h


Kara bi zorê û îstismara zayendî

Komeleya ASTRÉE alîkariya kesên qurbanên bazirganiya mirovan dike. Mînak di rewşa îstismara zayendî, karê bi zorê an qaçaxçîtiya organan de. Komele cihekî mayînê ji bo qurbanan û piştgiriyekê ji bo wergirtina parastineke hiqûqî, lênêrînên bijîşkî an alîkariyeke entegrasyona civakî û pîşeyî pêşkêş dike.


ASTRÉE - Association de soutien aux victimes de traite et d'exploitation
Ruelle de Bourg 7, 1003 Lausanne
Tel. 021 544 27 97, info@astree.ch, www.astree.ch

Baş e ku mirov bizanibe

Alîkarî û cihên pêşwaziyê ji bo qurbanên şîddeta malbatî hene. Ev çavkanî di rûpela 36-37 de têne pêşkêşkirin.



Veguhastin



Veguhastina giştî

Li tevahiya Swîsreyê

Li Swîsre toreke veguhastina giştî heye ku derfetê dide mirov here her derê. Hûn dikarin bilêt, abonman û qertên kêmkirinê li ser înternetê, li gîşeyan an li makîneyan bikirin. Hûn dikarin herwiha sepana «Mobile CFF» bikar bînin. Va ne çend pêşkêşî ji bo tevgera bi bihayên kêmkirî:

- **Billets dégriffés:** ev bilêtên bi bihayên kêmkirî ne. Ew tenê ji bo rêwîtiya hilbijartî derbasdar in û divê bi giştî hinekî pêşwext bêne kirîn. Billets dégriffés li ser sepana Mobile CFF bi sembola % têne nîşandan.
- **Abonmana giştî (abonnement général - AG):** ev abonman derfetê dide we ku hûn bi serbestî li tevahiya Swîsreyê rêwîtiyê bikin.
- **AG night:** ev abonman ji bo ciwanên heta 25 salî ye. Ew ji bo salekê 99 fr. e û derfetê dide ku mirov êvarê ji 19h ve, li tevahiya Swîsreyê bi belaş rêwîtiyê bike.
- **Nîvbiha (demi-tarif):** bi vê abonmanê, hûn bilêtên xwe bi nîvbiha didin.
- **Qerta rojane (carte journalière):** ew derfetê dide we ku hûn bi dirêjahiya rojeke tevahî bi veguhastina gişîtî li tevahiya Swîsreyê rêwîtiyê bikin. Qertên rojane yên bi bihayên avantajlî li ba Info cité (binêre r. 6) an Nivîsgeha Lausanne Tourisme (binêre r. 7) berdest in. Hejmara wan sînordar e, divê ew pêşwext bêne kirîn.
  www.lausanne.ch/carte-journaliere

Ji bo agahî û pêşkêşiyên bêtir, hûn dikarin serî li malpera www.cff.ch bidin.

Baş e ku mirov bizanibe

Li Swîsreyê, zarok heta temenê 6 saliyê belaş rêwîtiyê dikin, paşê bi nîvbiha ji 6 heta 16 salî. Bi qerta Junior (30 fr. di salê de), zarokên heta 16 salî yên bi dêûbavên xwe re belaş li ser tevahiya tora veguhastina giştî ya swîsrî rêwîtiyê dikin. Bala xwe bidinê ku bilêtên veguhastinê ji bo kûçikan... û bisîkletan jî mecbûrî ne!

Li kantona Vaudê

Veguhastina giştî ya kantona Vaudê di zonên tarîf de hatiye organîzekirin. Ji vê sîstemê re Mobilis tê gotin. Lozan li zonên 11 û 12ê tê. Hûn dikarin bilêtan ji bo yek an gelek zonan bikirin. Ev bilêt maweyeke derbasdariyê ya sînordar hene, ku di wê de hûn dikarin hemû veguhastinên giştî yên zona hilbijartî bikar bînin (otobus, metro an tren).
www.mobilis-vaud.ch

Li Lozanê

Bi Veguhastinên Gîştî yên herêma Lozanê (tl), hûn bi otobus, tren û metroyê li Lozanê û li şaredariyên derdorê digerin. Hûn dikarin bilêtan li makîneyan, bi SMSê an bi rêya sepana «tl» bikirin. Ji bo abonmanan, serî li malpera wan an navenda muşteriyan a Flonê bidin.

Centre clientèle tl Flon
Place de l'Europe 5B, 1003 Lausanne
Tel. 021 621 01 11, www.t-l.ch
Duşem heta Înê 8h-18h, Şemî 9h-16h

Baş e ku mirov bizanibe

Bajarê Lozanê piştgiriyên aborî li ser abonmanên veguhastina gişîtî yên Grand Lausanne (zonên 11 û 12) nemaze ji bo kesên teqawidbûyî û ciwanên di perwerdeyê de pêşkêş dike. Abonman ji bo kesên ku ji xizmetên temamker ên AVS/AI sûd werdigirin belaş e.
www.lausanne.ch/rabais-tl

Bisîklet

Bajarê Lozanê tevgera bi bisîkletê bi avakirina rêyên bisîkletan û sazûmanên din hêsan dike. Hûn ê hemû agahiyan li ser www.lausanne.ch/velo bibînin.
Bajar herwiha piştgiriya kirîna bisîkletên elektrîkî dike. Ew beşek ji bihayê kirînê vedigerîne: an 15% (di navbera 400 fr. û herî zêde 1000 fr. de li gorî modelê), an 50% (herî zêde 1000 fr.) ji bo yên di bin 25 saliyê de û kesên xwedî mafê subsideya sîgorteya nexweşiyê ya mecbûrî. Ji bo sûdwergirtina ji vê vegerandinê, hûn dikarin daxwazekê li ser www.equiwatt.ch bikin.

Tirimbêl an wesayîta motorî

Destûrnameyeke we ya ajotinê ya biyanî heye? Li gava hatina xwe ya Lausanne, wê bi destûrnameyeke ajotinê ya swîsrî biguherînin. Wesayîteke we ya motorî heye? Zû daxwaza plakayên qeydê yên swîsrî bikin. Divê ev 2 kar li ba Servîsa Otomobîl û Keştîvaniyê (Service des automobiles et de la navigation - SAN) bêne kirin, di nav maweya 12 mehan de piştî hatina we ya Lozanê.

Service des automobiles et de la navigation (SAN)
Avenue du Grey 110, 1014 Lausanne
Tel. 021 316 82 10, www.vd.ch/san
Gîşe: Duşem heta Înê 7h15-16h15
Navenda telefonê: Duşem heta Înê 8h-11h30, 13h30-16h15

Parking


Li Lozanê, hûn dikarin cihekî di parkingeke taybet de li hundir an nêzîkî cihê rûniştina xwe kirê bikin, bi têkilîdanîna bi geranceya têkildar re. Hûn dikarin herwiha wesayîta xwe di parkingên giştî de bihêlin. Hîn 3 pêşkêşiyên din ên parkingê hene ku divê mirov bizanibe:

- **Macarons:** şêniyên Lozanê dikarin macaronan bikirin da ku tirimbêla xwe demeke dirêjtir li ser zonên şîn an hin zonên spî yên di taxa xwe de bihêlin. Hûn dikarin wan li gîşeya Nivîsgeha Trafk û Rawestandinê (Office de la circulation et du stationnement) an li ser malpera wan bixwazin.
- **Parkings-relais (P+R):** ev pêşkêşiyeke kombînekirî ye, ango parkingek ji bo wesayîta we û bilêteke veguhastina giştî (zonên 11 û 12). Bi vî awayî hûn dikarin di yek ji 4 parkings-relais ên li derdora Lozanê de bihêlin û paşê bi metro an otobusê bigihîjin navenda bajêr. Ev pêşkêşî ji bo rojekê an mehekê derbasdar e.
- **Parkingên «Maweya dirêj»:** 18 parkingên «Maweya dirêj» tarîfên bi avantaj yên rojane pêşkêş dikin. Herwiha gengaz e ku mirov abonmaneke mehane çêbike. Abonman li gîşeya Nivîsgeha Trafk û Rawestandinê têne firotin. Berevajî P+Ryan, bilêtên van parkingan gihîştinê nadin veguhastina gişîtî.

Office de la circulation et du stationnement
Rue St-Martin 31, 1001 Lausanne
Tel. 021 315 38 00, ocs.receptions@lausanne.ch, www.lausanne.ch/stationnement
Duşem heta Înê 7h30-17h

Baş e ku mirov bizanibe

Ji bo bikaranîna otobanan li Swîsreyê, divê vignette hebe. Ew 40 fr. e û salekê derbasdar e. Hûn dikarin vignetteyeke pêvekirî (ku li ser cama pêş tê pêvekirin) li îstasyonên benzînê an nivîsgehên posteyê bikirin. Hûn dikarin herwiha vignetteyeke elektronîk li ser www.e-vignette.ch bikirin.



Kesên bi tevgera sînordar

Kesên bi tevgera sînordar dikarin daxwaza alîkariyê ji bo tevgerên xwe bikin:

- ji bo randevûyên bijîşkî
- ji bo demên vala (berber, sînema, şano, kirîn, hwd.).


Ji bo sûdwergirtina ji vê alîkariyê, divê mirov têkiliyê bi navenda bijîşkî-civakî (centre medico-social - CMS) ya herî nêzîkî mala xwe re deyne. Hûn dikarin li wê li ser malpera www.cms-vaud.ch bigerin. Pisporek pêdiviyên we dinirxîne. Ger hûn şertên dayînê pêk bînin, hûn qerteke rewabûnê distînin. Ev qert derfetê dide we ku hûn daxwaza veguhastinekê bikin û hemû agahiyan li ser mercên bikaranînê bistînin.

CMS – Transport Mobilité réduite Lausanne
Tel. 021 651 29 99, www.cms-vaud.ch

Baş e ku mirov bizanibe

Mafê kesên bi tevgera sînordar heye ku alîkariyan ji bo dayîna mesrefên tevgerên xwe bistînin:

- Sîgorteya nexweşiyê beşek ji mesrefên veguhastinê ber bi randevûyên bijîşkî ve vedigerîne.
- Bajarê Lozanê piştgiriya beşek ji veguhastinên dema vala dike. Kesê/a ku tê veguhastin heman bihayê bilêteke veguhastina gişîtî ya Lozanê dide (zon 11 û 12).



Budce, bac û telekomunîkasyon

Vekirina hesabekî bankê

Ji bo wergirtina meaşê xwe, dayîna fatûreyên xwe an şandina pereyî ji derveyî welêt re, bikêr e ku mirov zû hesabekî bankê li Swîsreyê veke. Ji bo kirina vî karî, hûn dikarin:

- biçin gîşeyên bankayan
- serî li malperên wan bidin.

Ji bo vekirina hesabekî, divê hûn belgeyeke nasnameyê pêşkêşî bankê bikin. Hin bank herwiha belgeyeke rûniştinê, belgeyeke meaşê an destûrnameyeke rûniştinê dixwazin.

Bac

Ji temenê 18 saliyê ve, divê her kesê/a ku li Swîsreyê dijî (çi kar û meaşê wî/wê hebe çi nebe) bac bide. Ji bo vê, divê hûn her sal daxuyaniyeke bacê temam bikin. Hûn vê belgeyê di destpêka salê de ji desthilata bacê distînin. Ew dikare li ser înternetê bi rêya xizmeta VaudTax bê temamkirin.
www.vd.ch/vaudtax


Ger meaşê we hebe, hûn dikarin her meh pêşdayînan (acomptes) bidin. Ev nahêle ku fatûreyeke mezin di dawiya salê de ji we re derkeve. Hûn ê agahiyan li ser www.vd.ch/acomptes.

Karkerên biyanî yên ku ne xwedî destûrnameya bicihbûnê (destûrnameya C) (permis d'établissement - permis C) ne, bi baca li ser çavkaniyê (impôt à la source) ve girêdayî ne. Ev bac rasterast ji meaşê wan tê girtin.

Administration cantonale des impôts (ACI)
Route de Berne 46, 1014 Lausanne
Tel. 021 316 00 00, info.aci@vd.ch, www.vd.ch/impots
Duşem heta Înê 8h-11h45, 13h30-16h30

Baş e ku mirov bizanibe

Hûn hewceyî alîkariyê ne da ku daxuyaniya xwe ya bacê temam bikin? Biçin nobedariyên AVIVOyê an Nivîsgeha Agahdariya Bacê (Bureau d'information fiscale) ya Bajarê Lozanê.
www.avivo-vaud.ch/impots
www.lausanne.ch/bif





Baca li ser kûçikan

Li Lozanê, hûn baceke li ser kûçikan didin. Divê hûn heywanê xwe li ba Nivîsgeha Bacan ya Lozanê (Bureau des impôts lausannois) daxuyînin. Hûn dikarin vî karî bi telefonê an bi rêya formeke li ser înternetê ya ku li ser rûpela www.lausanne.ch/impots-chiens berdest e bikin.

Bureau des impôts
Place Chauderon 9 (qata 1ê), 1001 Lausanne
Tel. 021 315 43 11, impots@lausanne.ch, www.lausanne.ch/impots-chiens

Alîkariyên aborî

Kesên ku zehmetiyên aborî hene dikarin serî li Servîsa Civakî ya Lozanê (Service social Lausanne - SSL) bidin. Ji bo destpêkê, hûn dikarin biçin pêşwaziya SSLê, place Chauderon 4. Ev gîşe we pêşwazî dike û nîşanî we dide ku hûn li ku derê alîkariyê bibînin. Ev kar bandorekê li ser destûrnameya rûniştinê nake. Li gorî rewşa we, wê berê we bidin van:

- **Info sociale:** alîkarekê/î civakî guhdariya we dike û bersivê dide pirsên we. Ew ji alîkariyên heyî we agahdar dike, an alîkariyeke aborî an piştgiriyeke civakî pêşkêşî we dike.
- **Navenda Civakî ya Herêmî (Centre social regional - CSR):** ew bi awayekî aborî alîkariya kesên hewcedar dike. Ew herwiha bi kesan re dimeşe da ku alîkariya wan bike ku serxwebûna xwe ya aborî ji nû ve bibînin.
- **Ajansa Sîgorteyên Civakî (Agence d'assurances sociales - AAS):** ew li ser sîgorteyên civakî û xizmetên civakî agahdar dike (binêre r. 43).

Service social Lausanne (SSL)
Place Chauderon 4, 1001 Lausanne
Tel. 021 315 75 11, ssl@lausanne.ch, www.lausanne.ch/ssl
Duşem heta Înê 8h30-11h45, 13h-16h30 (Pêncşem berî nîvro girtî ye)

Budce û deyn

Kesên ku pirsgirêkên pereyî an deyn hene dikarin serî li Yekîneya Rêkûpêkkirina Aborî (Unité d'assainissement financier - Unafin) bidin. Unafin bi belaş rewşa aborî ya kesî analîz dike û pêşniyaran dide da ku budce û aboriya xwe baştir bike. Ji bo girtina randevûyekê, divê mirov têkiliyê bi alîkarê/a xwe yê civakî re deyne an biçe Info sociale ya Servîsa Civakî ya Lozanê (Service social Lausanne – SSL) li place Chauderon 4 (li jor binêre). Ger pirsên we li ser birêvebirina budceya we hebin, hûn dikarin herwiha li nobedariya telefonê ya Parlons Cash bigerin. Pispor we agahdar dikin, pêşniyaran li we dikin û li gor rewşa we û pêdiviyên we ber bi saziyan an komeleyan ve rêbertiya we dikin. Bangkirin belaş û nenas in.

Parlons Cash
Tel. 0840 43 21 00, www.parlons-cash.ch
Duşem û Çarşem 8h30-17h, Sêşem û Pêncşem 8h30-13h

Alîkarî ji bo birêvebirina îdarî

Caritas Vaud bê pere alîkariya kesan di kar û barên wan ên îdarî de dike. Hûn dikarin hîn bibin ku fatûreyên xwe birêve bibin û bacên xwe bidin, sindoqa xwe ya nexweşiyê hilbijêrin an belgeyên xwe yên îdarî çêtir rêz bikin. Hûn dikarin beşdarî kursekê ya 3 saetan bibin «Mieux gérer ses papiers et son budget» («Birêvebirina çêtir a kaxiz û budceya xwe») an bi çend mehan daxwaza piştgiriyeke takekesî «Tout compte fait» bikin.

Caritas Vaud
Chemin de la Colline 11, 1007 Lausanne
www.caritas-regio.ch/fr/prestations
Mieux gérer ses papiers et son budget : Tel. 021 622 06 39, agir@caritas-vaud.ch
Tout compte fait : Tel. 079 342 23 99 (nobedarî Înê 10h-13h),
tcf@caritas-vaud.ch

Piştgiriyên aborî ji bo malbatan

Alîkariyên malbatî (Allocations familiales)

Alîkariyên malbatî alîkariyên aborî ne ji bo mezinkirina zarokekî. Ev ne alîkariyeke civakî ye lê mafekî qanûnî ye. Alîkariyek ji bo zarokên di bin 16 saliyê de, ji bo ciwanên di perwerdeyê de heta 25 salî û ji bo zarokên seqet heye.


- Ji bo kesên bi meaş, divê mirov daxwazê ji kardêrê/a xwe re bike.
- Ji bo kesên bi statûya serbixwe, divê mirov daxwazê ji sindoqa xwe ya berhevkirinê ya AVSê (caisse de compensation AVS) re bike.
- Ji bo kesên bêyî çalakiyeke qezencî, divê mirov daxwazê ji Ajansa Sîgorteyên Civakî (Agence d'assurances sociales) re bike (binêre r. 43).

Caisse cantonale d'allocations familiales
Rue des Moulins 3, 1800 Vevey
Tel. 021 964 12 11, www.vd.ch/allocations-familiales

Alîkariya komînî ya jidayikbûnê an pejirandinê (Allocation communale de naissance ou d'adoption)

Bajarê Lozanê alîkariyeke aborî di jidayikbûn an pejirandina zarokekî de dide malbatên bi rewşa aborî ya sînordar. Ji bo wergirtina vê alîkariyê, divê 2 şert bêne cîbicîkirin:

- Divê hatiniya malbatê kêmtirî 70'000 fr. be.
- Divê mirov di dema jidayikbûna zarokî de herî kêm 3 meh be li Lozanê bijî.



Mirov çawa jê sûd werdigire? Ji gava ku we zarokê/a xwe li Servîsa Kontrola Şêniyan (Service du contrôle des habitants) tomar kir, hûn nameyekê bi forma daxwazê re distînin ku divê ji Servîsa Tevlêkirin û Kirinên Civakî yên Nêzîk (Service de l'inclusion et des actions sociales de proximité - SISP) re bê şandin. Hûn ê forma li ser înternetê jî li ser www.lausanne.ch/acn bibînin. Divê daxwaz di nav 12 mehên piştî jidayikbûna zarokî de bê kirin.

Aides communales - SISP
Place Chauderon 7, 1001 Lausanne
Tel. 021 315 75 95, aides.communales@lausanne.ch, www.lausanne.ch/acn

Alîkariya takekesî ya xanî (Aide individuelle au logement)

Xanî dikare bibe barekî girîng li ser budceya malbatan. Alîkariya takekesî ya xanî piştgiriyeke aborî ye ji bo malbatên ku qezenceke sînordar hene. Ji bo sûdwergirtinê, divê zarokek an ciwanekî di perwerdeyê de di bin barê mirov de hebe, divê mirov herî kêm 1 sal be di xaniyê xwe de bijî û herî kêm 2 sal be li Lozanê rûnê.

Aides communales - SISP
Place Chauderon 7, 1001 Lausanne
Tel. 021 315 75 95, aides.communales@lausanne.ch

Baş e ku mirov bizanibe


Herwiha alîkariyên aborî ji bo zarokên li dibistanê hene. Mînak, ji bo xwarinên li kantînê, erkên bi hevrêtî an kampên betlaneyê. Hûn ê agahiyan di rûpela 33 de bibînin.

Telefon, televîzyon û înternet

Li Swîsreyê, gelek pargîdanî abonman an paketan ji bo telefon, televîzyon û înternetê pêşkêş dikin. Hûn dikarin daxwaza pêşkêşiyekê bikin ku gelek xizmetan kombîne dike. Servîsên Pîşesazî yên Lozanê (Services industriels de Lauanne - SiL) jî pêşkêşiyekê ji bo telefon, televîzyon û înternetê hene. Ji vê pêşkêşiyê re BLI BLA BLO tê gotin (binêre r. 18). Ji bo agahiyên bêtir biçin dikanê an serî li înternetê bidin.

Baca Serafe

Her kesê/a ku xwe li Servîsa Kontrola Şêniyan (Service du contrôle des habitants) tomar dike, salê carekê fatûreyekê ji bo radyo û televîzyonê distîne. Ji vê bacê re baca Serafe tê gotin. Ew ji bo her malbatekê mecbûrî ye.
www.serafe.ch



Jiyana civakî û dema vala

Dema vala girîng e ji bo ku mirov xwe li cihê xwe yê nû yê jiyanê baş hîs bike û derfetê dide ku mirov hevdîtinan bike. Lozan gelek îmkanên çalakiyan pêşkêş dike. Hûn ê hilbijartineke mezin a bûyerên çandî û werzîşî li ser ajandaya Bajêr bibînin. Hûn dikarin li gorî mijar, cih an dîrokê lê bigerin.

www.lausanne.ch/agenda

Huner û çand

Lozan bernameyeke çandî ya cuda di gelek waran de pêşkêş dike: mûzîk, şano, dans, hunerên dîtbarî, edebiyat û sînema. Hûn dikarin ji vê jiyana çandî di salonên şano û konserê, muze û galeriyên cuda de sûd wergirin. Bajar herwiha gelek festîval û bûyerên şevê pêşwazî dike.

www.lausanne.ch/culture

Baş e ku mirov bizanibe

Piraniya muzeyên li Lozanê di Şemiya yekem a her mehê de belaş in.

Kesên ku qezenceke kêm hene dikarin herwiha daxwaza CarteCultureyê bikin. Ew kêmkirinan li ser pêşkêşiya çandî pêşkêş dike. Hûn dikarin wê bi rêya forma li ser înternetê ccvaud.ch bixwazin.

Pirtûkxaneyên giştî û navçandî

Pirtûkxane pirtûkan bi fransî an bi zimanên cuda pêşkêş dikin. Hûn dikarin li wir herwiha amûrên komputerê û dengî û gihîştina înternetê bibînin. Pirtûkxane herwiha bernameyeke çandî ya cuda pêşkêş dikin. Abonman belaş e.

- Li bajarê Lozanê 6 pirtûkxane û pirtûkxaneyeke gerok, Bibliobus, hene ku li taxên cuda digere.
  www.lausanne.ch/biblio-vdl
- Pirtûkxaneya Zanîngehê ya Kantonî li ser gelek cihan hatiye belavkirin, li navenda bajêr û li kampusa zanîngehê.
  www.bcu-lausanne.ch
- Pirtûkxaneya navçandî Globlivres, li Renensê, pirtûkan bi zêdetirî 300 zimanan pêşkêş dike.
  www.globlivres.ch

Baş e ku mirov bizanibe

Bi qerta xwe ya pirtûkxaneyê, hûn dikarin ketinên belaş li cihên çandî (muze, sînema, salonên şanoyê) rezerve bikin. Katalogeke li ser înternetê pêşkêşiyên berdest nîşan dide.
www.lausanne.ch/empruntez-un

Pirtûkxaneya tiştan

Komeleya La Manivelle wek pirtûkxaneyekê dixebite, lê ji bo deynkirina tiştan. Hûn dikarin tiştên pêşkêşkirî li ser kataloga li ser înternetê an rasterast li cih bibînin.


La Manivelle
Rue St-Martin 38b, 1005 Lausanne
Tel. 078 944 05 06, lausanne@manivelle.ch, lausanne.manivelle.ch
Duşem, Çarşem, Înê 18h-19h45, Şemî 11h-12h45

Werzîş û çalakiya fizîkî

Li bajarê Lozanê nêzîkî 300 klûbên werzîşê hene û zêdetirî 50 bûyerên werzîşî her sal pêşwazî dike. Ew gelek bernameyên werzîşî yên belaş an bi bihayên kêm pêşkêş dike û navendan ji bo gel di destê wan de dihêle. Mînak, navendên werzîşê, qadên werzîşê, fitnesên derve, hewz û qadên xişandinê.

- Hûn ê hemû çalakiyên werzîşî yên ku ji aliyê Bajêr ve têne pêşkêşkirin li ser kataloga li ser înternetê www.lausanne.ch/liste-offre-sportive bibînin.
- Bernameya Laus'active herwiha gelek kursên belaş ên ku ji bo pîran û kesên ku dixwazin ji nû ve dest bi çalakiyeke fizîkî bikin hatine adaptekirin pêşkêş dike. Hûn dikarin serî li malpera www.lausanne.ch/lausactive bidin.
- Hûn ê lîsteya hemû klûbên werzîşê li ser www.lausanne.ch/clubs-sportifs bibînin.

www.lausanne.ch/sport



Malên taxê (maisons de quartier) û navendên civakî-çandî (centres socioculturels)

Li Lozanê gelek cihên anîmasyona civakî-çandî hene. Ev cih ji her kesî re vekirî ne û pir caran çalakiyên belaş an bi bihayên kêm organîze dikin. Mînak, çalakî ji bo zarokan û mezinan, kursên fransî, pêjgehê an dirûtinê, çalakiyên werzîşî an çandî, cejnên taxê, belavkirinên xwarinê an xwarinên gelêrî. Ev cih rêyeke baş pêşkêş dikin ku mirov li cihê xwe yê nû yê jiyanê entegre bibe, hevdîtinan bike û piştgirî an agahiyan bibîne.

Hûn ê lîsteya van qadan li ser malpera Weqfa Anîmasyona Civakî-Çandî ya Lozanê (Fondation pour l'animation socioculturelle de Lausanne - FASL) bibînin.

www.fasl.ch

Dilxwazî (bénévolat)

Dilxwazî ew e ku mirov dema xwe ji bo amancekê, sazîyekê an aktîvîteyekê bide. Beşdariya dilxwaz nayê dayîn, lê ew civakê, têkiliyên civakî û başbûna her welatiyekê/î dewlemend dike.

- Bénévolat Vaud : www.benevolat-vaud.ch
- Volontaires du Sport lausannois (VSL) : www.volontaireslausannois.ch.

Civakên dînî

Li Lozanê gelek civakên dînî û cihên îbadetê hene. Ji bo hin kesan, ev dikare çavkaniyek be ji bo entegrasyonê, ji bo naskirina kesan û ji bo dîtina piştgiriyê. Nexşeya înteraktîf a li ser înternetê ya Navenda Navkantonî ya Agahdariyê li ser Baweriyan (Centre intercantonal d'information sur les croyances) derfetê dide we ku hûn hemû civakên dînî yên herêmê bibînin: www.geo-religions.ch.



Jiyana hemwelatîbûnê

Gelek awayên beşdarbûna jiyana hemwelatîbûnê ya herêmî hene. Mînak, beşdarbûna komeleyekê an kolektîfeke taxa xwe, beşdarbûna bûyer û xwepêşandanan, dengdan.

Nivîsgeha Koçberan ya Lozanê (Bureau lausannois pour les immigrés - BLI) civînên agahdariyê, kêliyên guhertinê û gerên bi rêber organîze dike da ku beşdariya hemwelatîbûnê ya gel teşwîq bike. Ev «Rendez-vous citoyens» in (binêre r. 9).

Platforma «Lausanne participe» derfetê dide şêniyên Lausanne ku raya xwe bidin, projeyan pêşniyar bikin û beşdarî pêkanîna wan bibin.
participer.lausanne.ch

Mafên siyasî

Li Swîsreyê, welatî ji temenê 18 saliyê ve xwedî mafên siyasî ne. Ev derfetê dide wan ku:

- deng bidin
- hilbijêrin
- ji bo hilbijartinan bibin namzet
- însiyatîfeke gelêrî an referandumekê bidin destpêkirin û îmze bikin.

Gelê swîsrî pir caran tê gazîkirin ku li ser biryarên şaredarîyê, kantonî an federal deng bide û nûnerên xwe yên siyasî hilbijêre. Hûn ê agahiyan li ser mafên siyasî û dengdanan li ser www.lausanne.ch/votations bibînin.


Baş e ku mirov bizanibe

Li Lozanê, kesên bi netewetiya biyanî yên ku 10 sal e destûrnameya B an C hene û 3 sal e li kantona Vaudê dijîn dikarin beşdarî biryarên şaredariyê bibin. Ew dikarin deng bidin, hilbijêrin û li Encumena Şaredariyê bêne hilbijartin û însiyatîf û referandumên şaredariyê îmze bikin.

Derbasbûna Hemwelatîtiyê

Hûn dikarin di hin şert û mercan de daxwaza netewetiya swîsrî bikin (nemaze 10 sal rûniştin li Swîsreyê, 2 sal li kantona Vaudê, destûrnameya C). Jê re daxwaza hemwelatîbûnê tê gotin. Hûn dikarin li ser vî karî li ba Nivîsgeha Hemwelatîbûnê (Bureau communal des naturalisations) an li ser rûpela wan a înternetê agahiyan bistînin.

Bureau communal des naturalisations - BLI
Place de la Riponne 10, 1001 Lausanne
Tel. 021 315 22 31, naturalisations@lausanne.ch, www.lausanne.ch/naturalisation
Nobedariya pêşwazî û telefonê Sêşem û Înê 10h-12h





Nîşe

Bi piştgiriya:

canton de vaud
LIBERTÉ PATRIE

PIC
PROGRAMMES D'INTÉGRATION CANTONAUX

Weşanger: Ville de Lausanne, Bureau lausannois pour les immigrés (BLI) bi hevkariya Info cité

Design: alafolie.ch

Nîgar: Alexandre Pointet

Wêneyê bergê: © Thara Scippa, Ville de Lausanne

Çapkirin: PCL Presses Centrales SA

Îlon 2026, çapa 9em

Berdest bi zimanên:

Albanais / Shqip

Allemand / Deutsch

Anglais / English

Arabe / العربية

Dari / دری

Espagnol / Español

Français

Italien / Italiano

Kurmandji / Kurdî


Portugais / Português

Russe / Русский язык

Turc / Türkçe

Ukrainien / Українська

www.lausanne.ch/bli-vivre-a-lausanne



Hejmarên awarte

Awarteya bijîşkî (ambulans): **144**

Polîs: **117**

Agirkuj: **118**

Rega (rizgarkirina bi hewayê): **1414**

Bijîşkên nobedar: **0848 133 133**

Tengezariya derûnî: **143**

Şidet: **142**

Alîkariya zarok û ciwanan (Pro Juventute): **147**

Bureau lausannois pour les immigrés (BLI)

Place de la Riponne 10
1001 Lausanne

Tél. 021 315 72 45
www.lausanne.ch/bli
bli@lausanne.ch